

# WELAT

Ji PKDW'ê

biryarên girîng

Röpel 4

Heyfa min nayê

Li mirin û kuştinê lê...

Röpel 16



Jinê kurd ên fêminist:

Femîne Dîrvaçî  
Lê soşîna uelk xwe ne

Röpel 8-9



Dewlet bi me ne ewle bû

6

Ne tenê şâîr, kana çandê ye jî  
Cegerxwîn

10



Evinâ Fermî (2)

14

## Ji Xwendevanen

*EZ li Élihê dijîm û diçime liseyê. Wê rojê dema em belav bûn, li ber deri sulteyekî ji yê din re wisa digot: "Bi rastî zimanekî bi navê kurdî tune. Yanê ew zimanê ku jê re dibêjin kurdî, beşek ji zimanê farisî ye."*

*Ez bawer im ku ew sulte, ne ji Kurdistanê ye, lê ji rojavayê Tirkiyeyê ye. Di gotina vî sulteyî de jî diyar e ku hê ew mîjîye res, mîjîye bisafînê di serê hin kesan de heye.*

*Dema min gotina wî mîjî res, di serê xwe de derbas kir, ev yek hate bîra min: "Artêke tekûz nikare neteweyekê bigelîne, lê qelandina neteweyekê bi vemirandina mîjî pêkan e. Èdi dewlet nikare bi reşkirina mîjîyan jî me bigeline.*

SERWEXT/ ÈLIH

**BERPIRSÊN** Azadiya Welat ez we pîroz dikim. Ji ber ku we Mehmet Metiner, nivîskarekî islamî kiriye nav xwe. Ez bi xwe, li Azadiya Welat bi awirê neteweyî dînihîrim. divê kurd jî di warê hişyarkirina hesta neteweyî de bi hev re bixebeitin.

Zêdeyi nîvî gelê kurd misilman e. Dar li ser kokén xwe hêşin dîbin. Divê hûn bi giçikî li ser vê yekê bisekinin. Hem nivîsên olî hem jî yên neteweyî biweşînîn.

A. QADIR ÇETÎN/ STENBOL

W

## Me yekîtî divê

MEHMET GEMSİZ

**P**êwistîya gelê me bi yekîtiyê heye. Ji roja ku vî gelî dest biriye xwe û ji bo rizgariya xwe têkoşiyaye heta iro, ev yek ji rojeva wî derneketiye. Heta dikare bê gotin ku, vê pêwistîyê ji demê berê bêhtir iro xwe daye xuyakirin.

Azadiya Welat, di warê weşanê de politikayekê neteweyî daye ber xwe. Em, xwe ji ramanê ku ziyanê digihîne yekîtiya neteweyî bi dûr dixînin. Her wiha em pirdengî û pir-rengî siyasî û ya bawerî, ji xwe re wekî zengîniyekê dibînin.

Jixwe, gava ku ji yekîtiya neteweyî bê behskirin, ev pirdengî û pir-rengî nikare bê piştguhkîrin, ew jî, di nav de ne.

Xwendevanê delal, hûn jî dizanîn ku, di navbera du nivîskarê me birêz Osman Özçelik û birêz Mehmet Metiner de hin nîqaş çêbûn. Cara pêşîn nivîsa Mehmet Metiner di hejmara 7'an rûpela 13'an de,

bi navê "Dîn, kurdayetî û politîka" hate weşandin. Piş re jî nivîsa Osman Özçelik di hejmara 9'an, di eynî rûpelî de, bi navê "Qedehek av, dijminahiya dîn û xayîntî" wekî bersiv hate weşandin.

Li ser vê yekê em, heyeta weşanê li hev rûniştin. Der barê vê rewşê de em bi hev şêwirîn. Em gihiyan wê encamê ku, nivîsên bi vî rengî jî tu kesî re feydeyê naynin. Divê bê zanîn ku, em ne terefe vê nîqaşê ne jî. Di her du nivîsan de jî, tiştîn ku em diecibîn û naecibîn hene.

Bi vê mebestê, me bîryara xwe gihan-de her du aliyan. Em ji wan re spas dikin ku pêşniyaza me di cih dîtin. Bi vî awayî dawî li nîqaşê hat.

Me divê em çend tiştîn din jî bibêjin. Em ji nivîsên rexneyî, nirxandinî re ne gitî ne. Her wiha ji yên nîqaşan re jî. Lî bi şertî ku ew feyde bidine doza gelî me.

Ne ku teref pê "erîş"î hev bikin, hev pê tehl bikin. Hev pê bişînîn.

Wekî din di rojnameyê de, em bawer in ku pir-rengiyek heye. Gelek kesen ku ji aliyê raman û hîzr ve, em ne wekî hev, bi hêsanî dînîvisin û bêyî ku nivîsên wan bê sansurkirin, nivîsên wan têne weşandin. Ji aliyê din ve, daxwaza me ew e ku, hemû kurd (ji ci rengî dîbin bila bibin) hêz bidine hev, hev xurt bikin û ji bo serbestiya vî gelî gavan bi hev bidine avêtin.

\*\*\*

Xwendevanê hêja, di hejmara me ya heftan, di rûpela 7'an de şâşiyek çêbûye. Di dawiya nivîsa M. Agirî de, ya bi navê "Serhildana Qoçgirî bû destpêk, nebû dawî", hevokeke wiha derbas dibe: "Di 17'ê pûşperê de Alî Şêr bi 32 hevalên xwe ve teslîm bû. Serhildana Qoçgiriyê jî bi awayî qediya."

Di vir de tiştî şâş ev e: È ku teslîm dibe Alîşan e. Alî Şêr piştî têkçûna serhildanê, direve diçe Dêrsimê. Ji ber ku nav pîr dişibin hev, ev xeletî qewimiye. Ji ber vê yekê em ji we lêborîna xwe dixwazin.

## Hêvî û pêşeroja mirovahiyê

**M**edyâ, çapemenî û T.V'yên tîrk mîna hemû bûyerên li Kurdistanê diqewimin, çav û guhûn xwe ji girtiyen azadiyê Ahmed Ep yê ku li Girtigîha Ümraniyeyê dimîne. ku ji dilê xwe ve giran nexwes e, girtiye û li hemberî vê yekê bêdeng dimîne. Li dijî vê tewra şovenîst dengê gelê Kurdistanê TV'ya MED, rewşa heval Ahmed Ep bi awayekî bêalî pêşkêşî raya giştî kir.

Di 1'ê reşemîya 1996 an de, dema hevalê me birin nexwexaneyê li wir zarokekî 10-11 salî bala xwe dide wî. Ev zarokê dilpaqij û dilnerm, hay jê tune bû ku, ger çiqas nexwes û bêmecal be jî bi girtiyekî re nayê axaftin. Ji ber vê yekê, ew dixwaze xwe bigihîne cem wî.

Wisa dixuye, ev zarok bi armanca hînbûna tiştîkî, nêzîkî wî dibe. Lî belê leşkeren "qehreman" di dest wan de çek û jop, mîna ku welatê xwe ji parçebûnê xelas bikin(!) êrîşî vî sebiyê hanê dikin û bi çer û xeberan dikin ku wî ji wê derê bi dûr bixînîn.

Lî wî carekê kiribû hişê xwe ku ewê bi vî kesê girtî re biaxive. Li gel hemû çer û xeberen leşkeran, ji bo vê mebestê hemû rî û dirbêna axaftina bi heval Ahmed re diceriband.

Di dawiyê de zarok valahîyeke leşkeran dibîne û xwe digihîne wî û jê wi-

**Di van demên dawîn de,  
hînek rewşenbîr û nivîskar  
qala aşîfî û bersîvdayîna  
agirbestê dikin. Bêguman  
ev yek me şad dike. Lî  
belê, qetliam û hovîtiya ku  
dewlet li Kurdistanê  
dimeşîne, bi rexne, bi  
rexnekirna nivîsan tenê ne  
bes e. Ev tiştîn ku têne  
gotin û nivîsandin, ji bo  
encameke baş têri nake.**

ha dipirse:

- Hevalê nexwes, yê ku di TV'ya MED'ê de derket, ne tu bûyî?

Hevalê Ahmed jî dema dibêje "erê ez im", kurik wekî fermandarekî serkeftî ku ji cengekê derketibe, hêz dide xwe û bi gavê zû ji wir vediqete. Belkî jî wî di dilê xwe de derbas dikir ku gelo "Çima desten vî hevalî zincîrki ne, ji bo ci leşkeran dora wî pêçan?"

Ew jî li gorî xwe li ser vê bûyerê dikunîj. Nêzîkbûna vî hevalê biçûk, pêwist e ku ji hemû kesan re bibe mînake ke bas.

Bîvê nevê, hînek rewşenbîr û nivîskarê rojnameyean tîne hişê mirov. Bi

rastî di hemû civakan de, yên ku rîberiya gel dikin û guherînan di civakê de pêk tînin ev kes in.

Lî li Tirkiyeyê wekî her tiştî, ev ras-tî jî serûbinê hev bûye, hatiye vajîkirin. Di van demên dawî de, hînek rewşenbîr û nivîskar qala aşîfî û bersîvdayîna agirbestê dikin. Bêguman ev yek me şad dike. Lî belê, qetliam û hovîtiya ku dewlet li Kurdistanê dimeşîne, bi rex-ne, bi rexnekirna nivîsan tenê ne bes e. Ev tiştîn ku têne gotin û nivîsandin, ji bo encameke baş têri nake.

Ji ber vê yekê, xwendîna rojnameyên dewletê bêfeyde û bêmane ye. Lewre, her tiştî hatiye gotin û hê jî tê gotin. Lî, birêketin, xebat û cehd tune. Ev yek jî mirovan dike hevkare hovîti û qetliaman. Bi tenê gotin û peyya rast dişibe vî tiştî, mîna ku mirovîk rebendî ji hêla şerîn hov ve bê parçekirin û yekîê din lê mîze bike û bibêje, "Wax li min! Çiqas gune ye, heyfa vî delalî!"

Ji bo vê yekê, hêvî û xelasî di nîşen-nû de ye, yên ku li Kurdistanê di navâ têkoşîna rizgariyê de digihîjin. Hêvî di wî zarokê 10-11 salî de ye! Ev zarok kakîlê nirxên mirovahiyâ nû ye. Rizgarî û azadiya gelê me, di vê hêviyê de ye.

HASAN GUNDEN  
GIRTIGEHA UMRANIYE

Di hilbijartina giştî ya 24'ê berfanbara 1995'an de cerdevanekî bi navê Nesim Timur, Serokê Lijneya Hilbijartinê yê Navçeyâ Elkê (Beytuşebap) tehdît dike, da ku ji HADEP'ê re rey dernekevin. Nesim Timur, ji ber vê tehdît, di 30'yê berfanbara 1995'an de tê girtin. Paşê sê sed cerdevan li ser daxwaza Komulanê Alaya Şirnaxê Yücel Tuncer, digirin ser mehkemeyê û wî kesî didine berdan, ji ber vê yekê Serokê Dadgeha Elkê der heqê wan cerdevanan de dozê vedike. Lê Serokê DGM'ya Amedê Bekir Selçuk, diyar dike ku ew memûrê dewletê ne û livbaziya wan ji bo ewletiya dewletê súc nayê hesibandin."



**SEROKWEZIR** Mesut Yılmaz ji bo Nevruzê çû İdfî. Li gorf iddiaya çapemeniya tirk, wê Mesut Yılmaz li ser meselaya kurdan hin tiştan bibêje. Di nav tişten ku Mesut Yılmaz qafê bike de weşan û perwerdehiya bi kurdfî, bi riya saziyên taybet. Her wiha di rojeva hikümeta tirk de bi bin navê rakirina Rêveberiya Awarte de, xurtkîri na rayeyên waliyên bajaran heye. Tê gotin ku Serokwezirê Tîrkiyeyê li ser mafen mirovan ji hin tiştan bibêje. Derdorê demokratik didin zanîn ku ev liş pêk bêj jî têrif çareseriye kêşaya kurd nake, her wiha baweriya wan bi gotinêri Mesut Yılmaz jî nayê. Ji ber ku gotinê bi vî rengî gelek cararı hatin gotin, lê tiştek neguherî.

## NÛÇE

# Bêrûmetî nayê pejirandin

**Serokê Giştî yê PKK'ê**  
**Abdullah Öcalan, êvara**  
**20'ê adarê di MED-TV'ye**  
**de, da zanîn ku rayedarê**  
**tirk tu şensî nadîn aştiyê**  
**û ji şer pê ve tu rê li ber**  
**wan nahêlin. Li aliyê din**  
**derdorê demokratik ji**  
**rayedarê Tîrkiyeyê**  
**dixwazin ku şensekî bidin**  
**aştiyê.**

**H**esteya çuyî dîsa di rojeva Tîrkiyeyê de, kurd û aşti hebûn. Roja 17'ê adarê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan beşdarî programa MED-TV'ye ya bi navê "Panel" bû. Di vê bernamayê de Öcalan tevî gelek ramânîn li ser aşti û Newrozê, da zanîn ku wî ji Serokwezirê tirk re nameyek şandiye. Vê gotina wî dotira rojê, rojeva Tîrkiyeyê serûbin kir. Di rojnameyên tirk de, li ser nameyê daxuyaniyê Mesut Yılmaz ên dijber, derketin, lê di dawiyê de hate zanîn ku name gihîştiye cihê xwe. Li ser vê yekê rayedarê arşêş brîfingek dan Mesut Yılmaz.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, êvara 20'ê adarê di mesaja xwe ya ji bo Newrozê de, li ser vê helwesta rayedarê tirk sekinî û da zanîn ku ew nêzîkîtêdayîn ne rast e û nayê pejirandin. Öcalan diyar kir ku rayedârê tirk tu şensî nadîn aştiyê û ji şer pê ve tu riyan li ber wan nahêlin. Serokê PKK'ê di mesaja xwe de diyar kir ku êdî wê şer bi awayêñ nû bê meşandin. Li gorî gotina Öcalan, wê êdî gerîla li bajaran jî êrişen intîxarî pêk bîne. Öcalan, li Newrozê xwediderketina dewletê jî wekî zilmê bi nav kir û xwest ku gelê kurd destûrê nede vê yekê.

### Hewlidanêni ji bo aştiyê dom dikin

Her çiqas ji ber helwesta komara tirk agirbest hatibe radeya qedîn jî, çalakîyên ji bo aştiyê dom dikin. Wekî mînak, roja 15'ê adarê li ser navê 14 endamê Kongreyê Amerikayê, John Porter ji Bill Clinton re nameyek şand. Porter di vê nameyê de balê dikişine ser agirbesta ku PKK'ê ilan kiriye û ji

Clinton dixwaze ku piştgiriya polîtikayê Tîrkiyeyê neke û çekan nefiroşe vî welati. Porter gotina Clinton a bi rengê "Em li ser rûyê dinyayê karin bibin hêza aştiçeker û divê em bibin jî..." bi bîra wî dixe û jê dixwazê ku vê yekê ji bo kurdan jî bike.

Li gorî agahiyênu ku ketine destê me, ji seranserê dinyayê hezar kesî ev name ji Clinton re şandine û dîsa Tora Agahiyê ya Kurdan li Amerikayê (AKIN) di de zanîn ku, li Amerikayê 3 hezar kesî ev name imze kiriye.

Ji endamê Kongreyê Amerikayê Cynthia Mckinney jî, ji Clinton re nameyek şand û jê xwest ku ew helsikop-

e."

Li aliyê din gelek rewşenbîr, siyasetyan û zanyarênu alman, kurd û tirk di bin navê "Banga Hannoverê" de, di meha reşemiyê de daxuyaniyek dan çapemeniya alman. Di vê bangawazê de tê xwestin ku divê dewleta tirk bersivê bide agirbesta PKK'ê. Xwediyyê bangawazê, ji dewleta alman jî dixwazin ku helwesta xwe ya hişk a li dijî kurdan biterikine û qedexeya li ser rîexistinê kurdan rake.

Ji van kesen ku ev bang kirine Mamosteyê Zanîngeha Hamburgê yê Beşa Hiqûqê Prof. Dr. Norman Peach, tevî Serokê Şaxê Almanyayê yê Yekîtiya



Heyete alman û zanîn ku dewlet zile... Herdorê tirk.


teran yên bi navê "Super Kobra" nefiroşe Tîrkiyeyê. Mckinney îdiaya ku dibêjin "bi firotina wan firokeyan wê 9 sed kes bibe xwediyyê kar", bi vî awayî bersivand: "Hewce nake ku ji ber vê yekê kurdê sivil bêne kuştin." Dîsa Cynthia Mckinney dide zanîn ku dewleta tirk her sal 7 milyar dollarî li şer xerc dike û ji aliyê CIA'yê ve wekî weletekî bêaramî hatîye nîrxandin.

Endamê Kongreyê Mckinney ji bo aramiya Tîrkiyeyê û berjewendêni Amerikayê riya siyasi pêşniyaz dike. Li hemberî vê nameyê Balyozê Tîrkiyeyê yê Washingtonê Nûzhet Kandemir, geleki tengezar bû û îdia kir ku Mckinney di bin bandora lobiyêni li dijî tirkân de, maye. Li gorî îdiaya Kandemir, tu dewlet bi qasî Tîrkiyeyê baş nêzîkî kurdan nabe. Kandemir ev yek jî got: "Rewşa mafen mirovan ji ya li Amerikayê çêtir

Hekîmîn li Dijî Şerê Nukleer (IPPNW)'ê Ulrich Gottstein roja 18'ê li IHD'ya Stenbolê civînek ji bo çapemeniyê li dar xist. Her du zanyarênu alman piştgiriya xwe ya ji bo çareseriyeke aştiyane nîşan dan û çavdîriyê xwe yên li Tîrkiye û Kurdistanê jî anîn zi-man.

Zanyarênu alman diyar kirin ku PKK'ê di nava van sê mehan de tu livbazi pêk neaniye, lewre jî samîmîyeta xwe isbat kiriye. Lê dewleta tirk guh nedaye dengê aştiyê û operasyonê xwe domandine. Wan got ku "Li gorî agahiyê İHD'ye di vê dema agirbestê de 40 gund hatine valakîrin û pêkutiya li ser gel dewat dike."

Prof. Dr. Gottstein û Prof. Dr. Paech bersiv dan pirsên çapemeniya tirk ên der barê "binpêkirina mafen mirovan ji aliyê PKK'ê ve" diyar kirin ku PKK'ê



Abdullah Öcalan

çavdîriya Xaça Sor pejirandiye, lê dewleta tirk nehiştiye ku endamê Xaça Sor herin karê xwe bikin. Profesoren alman daxuyandin ku rayedarê dewleta tirk bi wan re hevdîtin çekirine û rî nedane ku ew herin serdana Ismail Beşikçi.

Li ser vê yekê jî axaftinê xwe wiha domandin: "Bi tenê Mebûsê ANAP'ê yê Culemergê Naim Geylani em qebûlkirin. Wî tişten pir xwes gotin, lê me paşî dît ku di bernamuya hikümetê de tu tişten ku ew dibêje, nîn in."

Li gorî gotina wan, Naim Geylani qala avakirina gundênu kurdan, pêkanîna wekheviya gelan, rakirina rîveberiya awarte kiriye. Zanyarênu alman pêwistiya dualibûna agirbestê, vebûna riya çareseriya siyasi û naskirina mafen çarenûsiyê yê gelê kurd eşkere kiri.

Dîv bê gotin ku peyamhînêrên medya tirk, bi pirsên xwe yên klasik xwestin heyetê tenezar bikin, lê bi bersivênu wan şermezar bûn. Bi taybeti wan dixwest coprivâniya heyetê derxin holê, lewre jî gotin, "Gelo hûn qet çûn Bosna û Çeçenîstanê?" Dema ew hûn bûn ku endamê heyetê ji bo van deran jî ci ketiye ser wan kirine, şermezar bûn. Her wiha eşkerekirina berpirsiya dewletê di qetîfama Basayê de, bû bersiveke baş ji bo peyamhînêru ku îdiaya resmî ya kuştina jin û zarakan bi destê PKK'ê tekrar kîr.

**SAMÎ BERBANG  
KANÎ XULAMÎ**

# PKDW'ê civîna xwe ya 4'an li Danîmarkayê pêk anî



**PKDW'ê, di civîna xwe ya 4'an de, li ser gelek  
pirsgirêkan sekinî û pişt da agirbesta PKK'ê.  
Her wiha pêwistbûna avakirina Kongreya Neteweyî  
hate eşkerekirin û tûrîzma dewleta tirk jî  
hate boykotkirin.**

GÜNEY ASLAN

**P**arlamento ya Kurdistanê a li Derveyî Welêt (PKDW), civîna xwe ya 4'an, di navbera 12 û 16'ê adarê de li paytexta Danîmarkayê, li Kopenhagenê çekir. Parlamento, di bin serokatiya Yaşar Kaya de, roja pêşî bi xwendina rapora Konseya Rêveber dest pê kir û li ser plan û programên pêşerojê, bi guftûgo û axaftinan dawî lê hat.

Di raporê de tê xwestin ku parlementer karbendiya xwe û têkiliyên xwe bi xelkê re bi rîkûpêk deynin. Kêmasiyên niha gerek e bibin ders ji bo gavên pêşerojê. Raporê bala endaman kişandine ser xalêن girîng ji bo çareserkirina problemen rojê, bi komên gel re têkiliyân û parastina berjewendiyên welêt.

Ji bilî vê di raporê de tê ragihandin ku pêwistiya parlementeran bi karûbarê profesyonelî û pêkanîna Kongreya Neteweyî bi şiroveyeke hemdem heye.

Raporê bal kişandine ser rewşa iro û şerê gelê Kurdistanê yê neteweyî. Dîsa tê de pêwistiya Kongreya Neteweyî hate dubarekirin. Her wiha li gorî rapo-

rê rîexistin û saziyên ku cih di nav Kongreya Neteweyî de negirin, ji çare-seriya pirsgirêken welêt û daxwaza azadiya welat jî dûr dikevin. Ji bo ku gelê kurd cihê xwe bi rûmetî di nava ci-vata cihanê de bigire, pêwistiya yekîtiya sazî û dezgehên Kurdistanî jî, di na-va rûpelên raporê de cih girtibû.

Civîna giştî ya PKDW'ê ji bili vê, ji bo boykotkirina tûrîzma dewleta Tirkîyeyê û di vê hêlê de pêwistiya destpêkirina batê jî, bi erêkirina hemû endaman pejirand. Biryar hate standin ku parlementer tev, bi dorvegerî li avahiya parlamento 15 rojan seranser bîmînin û di nava xebatê de cihê xwe bi xurî bigirin. Ji bo yekîtiya esnaf û dezgehêن bazirganî ku hejmara wan ji 15 hezaran bêhtir e û danîna rastmaliya neteweyî jî, bi giştî biryar hate standin.

Di civîna PKDW'ê de biryara rawestandina li ser problem û pirsgirêken kurd ên ku ji ber şerê qirêj ji Kurdistanê revîne û li cihanê belav bûne, girt. Bi vê re jî piştgiriya şer-rawestandina ku ji teref PKK'ê ve hatîye îlankirin

diyar kir. Dîsa hate pejirandin ku bi hêz û kom û kesên dost re li ser vê yekê têkiliyân danîn. Di guftûgo û axaftinan de kar hate dabeşkirin û li ser hêz û xurtiya têkiliyan hate rawestîn.

Di civînê de, li hember ewqas zor û zehmetî û tengaviyêni dijwar, pêşketin û xurtiya têkoşîna gelê kurd a neteweyî hate diyarkirin. Di civîna parlamento de ku 3 rojan berdewam kir, gelek biryaren din jî hatin girtin.

Bi giştî di civînê de li ser van mijaran hate sekinîn: Karûbarê pîrozbahîya salvegera PKDW'ê; di demen pêşerojê de gavêni ku wê di warê politika û diplomasiyê de bêne avêtin; mijûlahiya plan û programan; xebata Kongreya Neteweyî. Her wiha Parlementeran bi destûr axîvin û pêşniyaz anîn û li ser mijarîn wekî armanc, karbend, damezirandin û serokatiya konseyê, sekretêri, beşen karûbar, sekretêri, benden malxwetiyê, rîvebirinê biryar hatin standin.

## Piştgiriya Danîmarkayê

Piştî civîna giştî ya PKDW'ê, ji ali-yê Serokê Parlamentê Yaşar Kaya ve civîneke çapemeniyê hate lidarxistin. Di vê civîna çapemeniyê de pir kes ji parlamento ya Danîmarkayê besar bûn û piştgiriya xwe ji bo PKDW'ê nişan dan. Malxweditiya Danîmarkayê ji bo civîna giştî ya PKDW'ê, wekî her car

Hêjayî gotinê ye ku, civîna giştî ya PKDW'ê li kîjan welatî çêbe, dewleta tirk nexweşî û nerazîbûna xwe li hemberî wî welatî diyar dike. Ew jî dibe sedem ku têkiliyên komara tirk bi gelek dewletan re xera bibin. Tirkîyeyê piştî vê civînê, Danîmarka dîsa xiste nava listeya sor.

bû sedema dilnexweşî û nerazîbûna dewleta tirk. Wezîrê Karêne Derveyî yê Tirkîyeyê daxuyand ku wan berî civînê, bala Danîmarkayê kişandine. Wi got: "Tevî wê yekê jî, careke din Danîmarkayê destûra civînê da û dergehîn xwe vekirin." Bi vê gotinê diyar bû ku daxwaza dewleta tirk hatîye redkirin.

Wezîriya Karêne Derveyî yê Danîmarkayê jî di daxuyaniyeke nivîski de, da zanîn ku civîn, li gorî qanûnên Danîmarkayê yê demokratik û merc û daxwazan demokratik hatîye çêkirin û tu asteng jî derneketine. Daxuyanî, Tirkîye li hemberî gelê kurd tawanbar dike. Tê gotin ku divê Tirkîye di warê pirsgirêka kurdi de dev ji polîtikayê şer û kuştinê berde, riya diyalog û çare-seriya siyasi veke.

Hêjayî gotinê ye ku, civîna giştî ya PKDW'ê li kîjan welatî çêbe, dewleta tirk nexweşî û nerazîbûna xwe li hemberî wî welatî diyar dike. Ew jî dibe sedem ku têkiliyên komara tirk bi gelek dewletan re xera bibin. Tirkîyeyê piştî vê civînê, Danîmarka dîsa xiste nava listeya sor. Civîna pêşin a PKDW'ê li Laheya Holandayê, ya duyemîn li Viyanayê, ya sêyemîn jî li Moskovayê çêbûbû. Heke wisa here, têkiliyên Tirkîyeyê wê hîn bi gelek welatan re xera bibin.

# Newrozê Nevruz têk bir

**Newroz, bi beşdariya**  
**15 hezar kesî li Meydana**  
**Zeytinburnuya Stenbolê**  
**bi awayekî girseyî hate**  
**pîrozkirin. Kurdên ku li**  
**seranseri Stenbolê**  
**dijîn, li dora demjimêr**  
**12'yan li nik Salona Abdi**  
**İpekçi gîhiştin hev,**  
**bi qasî kîlometreyekê**  
**meşîyan.**

**N**ewroza îsal jî zû dest pê kir. Li Ewrûpayê roja 16'ê adarê li bajarê Almanyayê Dordmundê bi meşa 10-12 hezar kurdi deng veda li dinyayê. Li gorî agahiyênu ku kete destê me, di Meşa Dordmundê de alên PKK'ê, ERNK'ê, ARGK'ê û posterên Serokê Gişî yê PKK'ê Abdullah Öcalan hebûn. Di vê livbaziye de sloganên bîrâti û aştixwaziyê hatine qîrîn. Her çiqas pişti vê meşê, Almanyayê qedexe daniye ser Newrozê jî, kurdan li gelek bajaran cejna xwe pîroz kirin.

Li sinorê Almanyayê Belçikayê û Holadayê di 19 û 20'ê adarê de jî meş cebûn. Her wiha li bajarê Ewrûpayê yê cur bi cur ji konferans û şahiyê çandî û hunerî hatin sazkirin. Li Atînayê jî bi beşdariya Cîgirê Serokê Parlementoya Yewnanistanê û Mebusê PASOK'ê Panayotis Sgoyrîdîs li Sinemaya Akrepolê Newroz hate pîrozkirin. Ji partiyê Yewnanistanê yê din jî mebus di pîrozbahiyê de hebûn. Li Mos-



kovayê jî kurdan Newroz rojekê pêş de pîroz kirin. Li Tirkîyeyê jî bi rîberiya HADEP'ê pîrozbahiyê Newrozê çebûn. Ji ber ku li gelek bajaran serîlêdanen HADEP'ê yên ji bo pîrozkirina Newrozê ji aliyan waliyan ve nehatin qebûlkirin, pîrozbahî bi awayekî fiili hatin çekirin.

Li Amedê di 20'ê adarê de li taxên Bağlar, Fatih û li kolanan, kurdan agirê Newrozê pêxistin, bi listikên folklorik, sloganên weki "Newroz ya meye, Biji PKK, Serok Apo" avêtin û bi vî awayî heta serê sibê Newroza xwe pîroz kirin. Serokê HADEP'ê Murat Bozlak, Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras, Serokê SIP'ê Aydemir Güler li Amedê Newrozê bi gel re pîroz kirin.

## Li Stenbolê meşa girseyî

Newroz, bi beşdariya 15 hezar kesî li Meydana Zeytinburnuya Stenbolê bi

awayekî girseyî hate pîrozkirin. Kurdên ku li seranseri Stenbolê dijîn, li dora demjimêr 12'yan li nik Salona Abdi İpekçi gîhiştin hev, bi qasî kîlometreyekê meşîyan. Di pêsiya kortejê de keşen mina Kemal Parlak, Ayşe Zarakolu û hinek rayedarên HADEP'ê nûneren saziyên demokratik hebûn. Ji bo çavdîriyê jî nûneren rîxistinê mafêni mirovan ên navneteweyî hatibûn. Hêjayî gotinê ye ku di dema meşê de xwendekarêñ dibistanan, maliyên derdora re û xebatkarêñ karistanan bi cepikên xwe piştgirî dan meşvanan.

Di nav besdaran de ji zarokên büyük bigirin, heta kalêñ heftê sali hebûn. Wan li ber daholê govend girtin, agirê Newrozê vêxistin, di ser êgir re qewaz dan. Di pîrozbahiyê de sloganên weki "Biji Newroz", "Newroz pîroz be", "Em şerê qirêj naxwazin", "Biji Serok Apo", "Gerila lê dixe, Kurdistanê bi re

dixe" hatin avêtin. Di pîrozbahiyê de gelek pankartên ku li ser sloganên bi vî rengî hatibûn nivîsin jî, hebûn. Ji xeynî wan jî gelek alên ERNK'ê û pankartên rîxistinê weki DHP, MLKP û Rizgarî û hwd. bal dikişandin. Li gelek taxên Stenbolê polisan re girtibûn û nehiştibûn ku kurd bigihîjin cihê pîrozbahiyê. Tiştekî balkêş bû ku çapemeniyê eleqeyekê zêde nişanî pîrozbahiyê dan. Di nav wan de gelek peyamhînêrên çapemeniya biyan jî hebûn. Pîrozbahiya ku di demjimêr 12'yan de dest pê kir, heta êvarê dewam kir. Pişti pîrozbahiyê, polisan tevi Serokê HADEP'a Stenbolê Kemal Parlak û hinek rayedarên HADEP'ê birin şaxa terorê.

Li aliyê din İHD'ya Stenbolê li ser Newrozê bulteneke taybet derxist û ew bi meşekê li Cadeya İstiklalê belav kir.

Li Enqereyê, İzmîrê, Edeneyê, Mêrsinê jî cihê ku hejmareke mezin a kurdan lê hene jî Newrozê zû dest pê kir. Li Mêrsinê li meheleya Yenipazar, Gündogdu, Siteler, Demirtaşê di saet 18.00'ê êvarê de kurdan Newroz pîroz kirine. Li ber def û zirnê govend girtine, tilfili û sloganên weki "Biji Newroz, Biji PKK, Biji biratiya gelan" avête. Polisan mudaxale nekiriye. Li hêla din di bajarê Kurdistanê tevan de li gorî agahiyênu ku ketin destê me gel tu eleqeyî nişanî Newruza dewletê nedaye û beşdar jî nebûne. Roja 20'ê adarê li İdirê ber bi êvarê Newruza ku dewletê dabû destpêkirin jî ji bili sed-dused kesî beşdar tune bûne.

Li Zanîngehêñ Stenbolê, İzmîrê, Edeneyê û Enqereyê jî, telebeyan Newroz pîroz kirin.

METİN AKSOY  
DÜZGÜN DENİZ

## Zanîngeha Kurdistanê medrese (1)

CELALETTİN YÖYLER

**D**i jîyana neteweyî ya Kurdistanê de jî medreseyê re cîhekî pir bi rûmet û girîng heye. Bi zanîna min medrese, hem xwendegheha olî ye, hem jî cihê rewşenbîri, çand û wêjeyê ye.

Destpêka xwendin û xebata medreseyaya Kurdistanî, digihîje gav û demên pejirandina İslamiyetê ya gelê Kurdistanê. Vê neteweyê bi pejirandina İslamiyetê re, rûmeteke pir mezin û girîng daye olê û xwestiye ku vê olê baş bizanibe û binase.

Bi vê ramanê bingeha xwendin û zanîna li medreseyê tê avêtine. Bi vê ramanê medrese, roj bi roj bi pêngavên girîng û xurt, ber bi pêşveçûyneke ronak û bi rûmet dimeş. Di vê pêşveçûnê de, li medreseyê cur bi cur beşen zanistê bi "feqîyan" didin xwendin û ew tê perwerdekirin û feqî muntehî (mezûn) dibin. Her yek ji wan


muntehiyên medreseyaya kurdî, bi birekî agahiyê zanyariyê dihatin xemilandin. Wek hizanîna fiqhî û hedîsê û tefsîrê, ya nehwê û serfê û mantiqê, ya istifareyê û çand û wêjeyê. Ev bû rewş û xemla medreseyê, bi peywendiyênen xwe yên bi rûmet û xurt dikeve nava şîn û şahiyênen gelê kurd û nava pevçûn û lihevhatinên wan. Ew bi rîberiya xwe ya olnasî û olperestî mirovan li hev dide şêwirandinê û rûniştandinê. Medrese di nava gel de hem dibe "dodgeh", hem jî dibe parêzvanê mafêni her kesê ku hemwelaşî ne di nav wî gelî de. Ev tevger û rewşâ medreseyaya Kurdistanê tevger û xebata wê ya herî berîn û pêşin e. Ji bo nirxandina li ser vê zanîngeha bi rûmet, dema ku radihêjim qeleme, ez dixwazim pêşî aliyê wê yê erêni (pozitif) binirxînim. Dema ku ez di pencereya dîtin û nêrîna xwe ya medreseyê re dinêrim, ez bingeha damezrandina vê sazûmanê pir girîng û bi rûmet dibînim.

Belê, bi rastî di warê zanistîyê de medrese xwendegheha bilind û zanîngeha li Kurdistanê ye. Lewre bi tenê di yek şaxekî

de bi tenê ders nehatiye dayîn, di hemû şaxen zanistîyê de û yên çand û wêjeyê de dersên xwe dane meşandin. Medrese di demen berî dagirkirina Kurdistanê de, çawa ku me di pêşiyê de jî got, "dodgeh" gelê kurd e. Her kes bi rêz û rûmet pirşirikên xwe dibine medreseyê û wê darizandinê bi sertewandin û bi rûmet dipejirîne, hem jî parastina mafê xwe di medreseyê de dibîne.

Bandora medreseyê bi rewşa xwe ya pozitif li ser gelê kurd di destpêkê de berî dagirkirina welat de bi rûmetkê mezin tê nirxandin. Ji ber vê yekê, dema ku dagirkirê tune be, mîtingeriya olî jî pir nayê kirin. Di wan deman de, medrese her tim ne tenê bûye sazûmana neteweyî ya rewşenbîri ji bona gel, di warê mafêni mirovan de jî xizmetê dide. Anglo medreseyê berî mîtingeriye û dagirkiriyê de, roleke pir mezin lîstiye, ji bona pêşveçûyina gelê Kurdistanê.

Lewre rewşenbîri ji medreseyan, mele ji medreseyan, dadger ji medreseyan, hozan ji medreseyan, helbestvan ji medreseyan, xwendevan ji medreseyan, feqî û seyda ji medreseyan derketine.



# Dewlet bi me ne ewle bû

Kurê wê yê mezin İbrahim ev 4 sal in ku gerîla ye, kurê wê yê biçûk Resûl jî beriya 2 salan ji hêla sercerdevan Bahô Axa ve, tevî hevalekî xwe ve tê kuştin. Pişti vê bûyerê dewlet gundê wan û yên der dorê bi darê zorê dike cerdevan. Rewşa gelek malbatan, mîna ya dayika Fatimê ye.

**N**avê wê Fatim Erdogan e, 60 salî ye. Ji gundê Xaranê (Yatağankaya) ye, ku beriya bi demekê qetliamak li wir hatibû kirin. Beriya qetliama Basayê bi du mehan ji ber zilm û zora dewletê çekên xwe yên “cerdevaniyê” ber didin. Ew ji aliye kî ve, zilamê wê Silêman jî ji aliye kî din ve baz didin ta ku li Ceyhana Edeneyê li mala mirovên xwe, hev dibînîn. Tişten ku hatine serê wê li gorî gotina wê “nehatiye serê kafiran jî.” Wê du lawên xwe dane têkoşîna rizgariya kurdan. Kurê wê yê mezin İbrahim ev 4 sal in ku gerîla ye, kurê wê yê biçûk Resûl jî beriya 2 salan ji hêla sercerdevan Bahô Axa ve, tevî hevalekî xwe ve tê kuştin. Pişti vê bûyerê dewlet gundê wan û gundê derdorê bi darê zorê dike cerdevan. Ji wan gundan rewşa gelek malbatan, mîna malbata dayika Fatimê ye.

\*\*\*

Beriya cerdevanîtiyê hûn dikarin behsa gundê xwe Xaranê bikin?

—Gundê me Xaran, beriya qetliama Basayê ji 20 malê pêk dihat. Lê beriya 3 salan ku em bibin cerdevan, di gund de 50 malen ava hebûn. Pişti ku dewletê xwest cerdevaniyê li gund bi cih bîke, 30 mal ji gund derketin. Ew malbatan ku man em jî di nav de, me xwest ku em jî derkevin, lê wê çaxê sercerdevan Bahô Axa û Başçawîşê Qereqola Bizinan dest danîn ser me. Nehîstîn ku em ji gundê xwe derkevin. Em di destê wan de bûbûn mîna “êşirê binê beriyê.”

Hûn bi ci awayî bûn cerdevan?

—Ma çawa. Bi kote kî û bi zilmê di-gotin “Hûn nebin cerdevan emê we bîkujin.” Zilamê min, bi girîn û qîrîn çekên dewletê hilgirt. Bi rojan di qirika me de gepek nan û qurtek av derbas nebû. Kurê min ê biçûk Resûl ev yek qebûl nekir. Got: “Heger ez bibim cerdevan an dewlet wê min bikuje, an jî wê birayê min ên PKK’yi min bikuje.”

Xwest ku ji gund bireve. Ew û 4 hevalen wî reviyan jî. Min bi xwe ew bi rî kir. Lê bila çavên xayînan birijin. Dema direvin, ji hêla leşkerên Qereqola Bizinan ve têne girtin. Wan hewaleyi Basayê dikan. Pişti re xeber didine sercerdevan Bahô Axayê belqitî. Bahô Axa ji wan 3 kesan berdide, lê ew kurê min Resûl û Mihemedê kurê Ehmed, bi destê xwe dikije. Pişti ku dikuje wiha dibêje: “Ji ber ku Resûl birayê gerîla

bû, Mihemed jî milis bû; di şer de hatine kuştin” (Pişti van gotinan çavê wê bi hêstiran tijî dibe, dixwaze bigiri, lê nikare. Çavên xwe bi dawa fistanê xwe paqî dike û peyvîn xwe didomîne).

Kurê min Resûl 20 salî bû û hê nû zewicibû. Denia tê kuştin hê qondereya zavatiyê di piyê wî de bû. Wan, neynûkên tiliyên wî jî hilkiribûn û ew ji hev pelişandibûn. Pişti kuştinê bi salekê,

“Zilamê min, bi girîn û qîrîn çekên dewletê hilgirt. Bi rojan di qirika me de gepek nan û qurtek av derbas nebû. Kurê min ê biçûk Resûl ev yek qebûl nekir. Got: “Heger ez bibim cerdevan an dewlet wê min bikuje, an jî wê birayê min ên PKK’yi min bikuje.”

birîndar bû. Dema ew diçûn operasyonan, min jê re digot: “Heger tu yê mirinê bî, ya Şex Evdilqadîrê Geylanî, ku tu ji wê derê neyî.” Wî jî digot: “Xwezî ez bibim hedefa tivingen karkeran (PKK’yiyan) û ew nebin hedefa tivinga min.” Gundî tev jî diçûn operasyonan, lê bêdilê xwe diçûn. Me meas jî distand, lê bi navê Xwedê me qurişek jî nedixwar. Ji cerdevanê gundê me nivî

dolmîşa Salihê Hiseyn; ji gundê Sewadiyê. Ew, Salihoyê şofêr bi kuştinê tehdît dikan. Dibêjin ku wî ev yek bi zanebûni kiriye.

Em werin ser wehşeta Qetliama Basayê. Di nav 11 kesen ku hatine kuştin de, kî ji kîjan gundi bû, çendên wan cerdevan bûn û di nav wan kesan de mirovîn te hebûn gelo?

—Ji 11 gundiyan ku hatine kuştin û şewitandin, 6–7’ê wan cerdevan bûn. Ji wan, 2 kes ji gundê Sewadiyê, 2 kes ji Gêrê, yek ji Zivinga Şikakan, 4 ji Bîzinan û 2 jî, ji gundê me Xaranê bûn. Di nav wan kesan de tiyê min Xalid û biraziyekî min jî hebûn. Keça tiyê min Xalid, Dîlan ev 4 sal in ku gerîla ye. Dewletê bi zorê meas dida Xalid, lê wî tu car qebûl nedikir. Her tim digot: “Ez measê we navêm.” Xalid yek carek meas stand û ew jî, ji hevalan re rî kir.

Heyetek çûbû cihê qetliamê. Haya we ji wê çêbû?

—Belê kurê min. Pişti heyet ji gund vedigere, leşker û serceş Bahô Axa agir berdide mala me û 4 malen din. Ji ber ku tiş miş ji heyetê re gotine jî, 2 kesi bi xwe re birine û li wan işkence kirine. Em bi telefonê hînî wan yekan bûn.

Hûn cerdevan bûn, we çekên dewletê jî hildabûn û ev qetliam jî bi serê we de hat. Gelo sedem ci bûn?

—Kurên min sedem ne yek e, ne dido ye ku ez ji te re bibêjim. Jixwe ji roja pêsi ve, em ketibûn nav “derdê bêderman.” Me çekên dewletê hilgirtibûn. Lê me alîkariya dijminê dewletê dikir. Şev û roj heval di nava gund de bûn. Bi dehan şehîd û şervanên gund hebûn. Me yê bi ci awayî bi dilgermî û bi dili “cehşîfî” bikiye?

Neyarê me jî, ev yek, yeko yeko lî cem xwe dinivîsandin. Heta hilbijartînê, dengê xwe nekir. Pişti hilbijartînê dît ku, HADEP di gundekî wiha cerdevan de jî, ji partiyen din zehftir ray wergirtiye, zilm û kote kîya xwe jî zedetir kir. Gelek kes girtin û li wan işkence kirin. Dixwestin ku, kesen rayen xwe dane HADEP’ê eşkere bibin. Pişti re jî ev qetliam anîn serê me. Kuştina me têrî nekir, wan em şewitandin jî. De kurê min, ka bisikine pirsekî jî ez ji te bikim: “Gelo ev tişten ku hatine serê me, bi serê cûhiyan de jî hatine?”



keça min Selîma, ji qehra birayê xwe beheci û mir.

Beriya 4 salan jî, kurê min û mezin İbrahim, ji ber ku li gund welatparêz bû û her tim dibû hedefa êrîşen dewletê, derket serê çiya. Beriya rojiya renezanî bi 4–5 rojan jî, jina wî û 3 keçikên wî (Gulê, Asiya, Sariya) diçin xwe digîlinin hevalan. Em yeşin dikan ku ew neha li Kampa Etrusê ne.

Cerdevanen gundê we, diçûn operasyonan?

—Belê. Zilamê min Silêman ku Xwedê bela xwe bidê, di operasyonekê de

zedetir, measen xwe ji hevalan re, rî dikirin.

İro em dibînin ku hûn û zilamê xwe bi serê xwe mane û hûn di Edeneyê de derketine. Gelo hûn çawa jî destê wan reviyan?

—Silêman di riya Kerboranê de direve. Cerdevanen Mêrdinê wî digirin, lê bi zorekê wî berdidin. Ez jî bi dolmîse (mînibusê) hatim Sertê. Ji wê derê jî ez hatime Ceyhana Edinayê. Ez û zilamê xwe, li vê derê rastî hev hatin. Pişti ku em hatin, ji ber ku ez anîme, cerdevanen Bahô Axa 10 rojan dest datînin ser



## ● 23 adar 1947

Qazî Mihemed û hevalêni wî li Meydana Çarçirayê, ji aliyê dewleta ïranê ve hatin daleqandin. Di sala 1946'an de Komara Kurdistanê ya Mehabadê bi serokatiya Qazî Mihemed ava bûbû.

## ● 30 adar 1972

Qetfama Kızıldereyê. Hêzên dewleta tirk, rêberê THKP-C'ê Mahir Çayan û 9 hevalêni wî li gundê Kızıldereyê kuştin. Ji nava wan bi tenê Ertugrul Kürkçü bi saxî xelas bû.

## ● 28 adar 1986

Mahsum Korkmaz (Egî) kete nav refen şehîdên Kurdistanê. Fermandarê

HRK'ê yê yekemîn, li Çiyayê Gebarê bi hêzên dewleta tirk re ketin şer. Di vî şerî de Mahsum Korkmaz şehîd ket.

## ● 30 adar 1992

Mele Evdrehmanê Timoqî, çû ser dilovaniya xwe. Mele Evdrehman jîyanekê berxwedêr li hemberî dagirkiran derbas kir û di dawîya jîyanâ xwe de jî kete nava keç û kurên xwe yên şervan.

## ● 30 adar 1995

Cara yekemîn televizyonê kurdi bi navê MED-TV'ye li Îngîlîtereyê ava bû û bi peyka Eutelsat 2 ve dest bi weşana ceribîni kir. Berê pêşin rojê 3 saet weşan dikir, pişt re weşan derkele şeş saetan.

## AWIR



## Xîret hîn li piya ye

Jî kerema xwe re nasnameyên xwe derxin," bi vî dengî em ji xewê hişyar bûn. Saet şesê sibê bû. Dîsa em gihiştibûn cihê kontroleke nasnameyan, ku gelek caran ji ber formalîteyê bû. Kontrola nasnameyan ji bo mirovîn ku li vir dijin, tiştekî ji rezê bû.... Ez di hemû bêhnvedanê somestreyê de dicim welêt. Ji ber van çûn û hatinê berî hingê, me li derdora Meletiyê rojnameya Demokrasî û Azadiya Welat vêşti'bûn. Berî vê carê, dema ez çûbûm welêt, xorhekî ku rojnameya Yeni Politikayê pê re bû ji erebeyê peya kiribûn û kutabûn.

Kontrolkirina nasnameya ku me li dûv xwe hişti'bû, mîna ku em ketine welatekî ku sinorîn wî nehatine kifşkirin...

Li aliye rê, yê çepê çemê Fırat hebû, ku carinan giyan distand, lê gelek caran ji jiyan dida derdora xwe û bi xemgînî ji wehşeta ku her roj diqewimî re dibû şahid, diherikî....

Li ser xaniyêne gundê cerdevan ên li qerxa rê, ên kerpiçî alên tirkan bilind dibûn. Li gundê ku ne cerdevan bûn jî, li ser banê wan antên peykê hebûn. Pişti ku em ji wê derê dûr diketin ji xeynî kontrolkirina nasnameyan a ku serê çend kilometreyan carekê çedibû, tiştekî ku bala mirov bikişîne tune bû. (...)

Ü Batman....

Di awira yekemîn de ji xeynî çend avahîyên ku nû ava dibûn, tu guherîn bi çavan na-kevin. Lî guherîn zehf in.

Ewrê tirsê yê ku xelk dîl girtibû, piçekî belav bûye; mirov bêtirs heta derengiya şevê li nava bajêr digerin. Li çayxaneyan, dîsa weki berê bêtirs dikevin guftûgoyan. Rojname û kovarêni ku berî hingê nedihatine bajêr, niha bi serbestî têne firotin. We divê, navê vê yekê deynin, bibêjin arama pişti bahozê û we divê bibêjin arama berî bahozê... Berî niha bi salekê, çawa şevreş dikete erdê; şik, îxanet û cinayetên kîyar diyar (fâlî kîfş) li deverê bûn. Li bajêr wateya tirsê bêrûmetî, pêzewengî û qewadî hû. Rewşa bajêr a niha, qada du boksorêni ku di dema bêhnvedanê de ne, tîue bîra mirov.

Agirbesta PKK'ê riheti anî bajêr. Çend sedemêne vê rihetiyê yê din jî ev bûn: Di hilbijartina dawî de, mitîngîn HADEP'ê gel nêzîkî hev kiribû; MED TV ji hemû kanalên din bêhtir dihate temâşekirin û berî niha bi demekê, li hemberî kesen ku di nav gel de kontra dihatin nasin, hin operasyon çebûbûn.

Guherîneke din jî ev bû: Polîtîkaya ziwarînina zeryayê hinek encam daye. Mirovîn ku gundêne wan hatine xerakirin, hatine bajêr. Jixwe bêkarî li Batmanê zehf bû, bi vê koçberiyê re jî jiyan bûye sefalet.

Ew roja sisîyan bû ku, ez çûbûm; me li dikana hevalekî çay vedixwar. Wê demê mirovek kete hundir, bi dengekî sermokî û xemgîn got: "Karekî we yê ku were kirin heye?" Li hemberî vê daxwazê, em matmayî man, me nizanîbû bê em ci bersivê bidinê. Zilam gotina xwe dubare kir: "Karekî we yê ku were kirin heye?" Zimanê me li hev herbilî û pişt re me gotê: "Na apo, karekî me yê ku were kirin nîn e." Zilam li dora 40-45 salî bû. Di çavêne wî de xemgîniyeke bêdawî ya mirovî ku li devekerê dûr tiştekî xwe yê gelekî bi qîmet winda kîriye û lê digere, hebû. Berî derkeve, ber bi derî ve çû, hevalê min hate ser xwe, destê xwe avête bêrîka xwe û gotê: "Deqekê!" Zilam li pereyê ku jê re hatibûn dirêj kîrin nîrî, weki ku bixwaze bibêje ez ne parsek im, lê nikarîbû bibêje, tenê bi xemgînî besîşî. Destê xwe jî neda pereyê ku jê re hatibûn dirêj kîrin û ji dikanê derket çû....

Pişti wê bûyerê bi rojekê, di nava bajêr de konvoyeke leşkerî ya nêzîkî kilometreyekê dirêj bû, derbas bû. Di hundîrê sê-çar cemseyan de jî gundiyyen ku çavêne wan girêdayîbûn, hebûn. Hin leşkerêni di cemseyan de bi tiliyêne xwe işareta gur (ya faşistîn tirk) çedîkirin. Hinekan jî alên di destê xwe de dihejandin. Bi serbilindî (!) didane xuyan ku ji gundekî ku nû vala kîrine tên.... Dema min ew diditîn gundiyyê berî rojekê heta bîra min, birîneke min a kevin, ji nû ve bi xwîn bû.

TARIK BORA

## ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS

Zimanê Hind-Ewrûpî  
6 hezar salî ye

Koma zimanê Hind-Ewrûpî xwedîyê dîrokeke kevin e û gelek fireh e. Wekî ku tê zanîn ew kom di nav xwe de beş dibe. Heft beşen wê yên mezîn hene. Ji aliyê zimanzanê ewrûpî ve, ev heft beşen zimanê Hind-Ewrûpî wiha hatine binavkirin:

1. Beşê Romanî: Fransî, spanî, italî, portugalî, romanî
2. Beşê Keltî: İskoçî, iriskî, galeri, walesî û bretonî
3. Beşê Germanî: Almanî, İngilîzî, holandî, swêdî, norvecî û danîmarkî
4. Beşê Baltikî: Litani û letî
5. Beşê Slavî: Rûsi, ukraynî, çekî, slovakî, serbokrafi, makedonî û bulgarî

6. Beşê Iranî: Kurdî, farisî, hîndî, bengalî, afganî
7. Ermenî, albanî û grekî, ew jî komeke serbixwe pêk tînin.

Heta niha zimanzan û lêkolîvan di vê mijarê de gihiştibûn van zanîn û encaman. Niha ditin û lêkolînên nû derdikevin holê. Hinek tiş zelaltır dîbin. Cografya, temen û koka koma zimanê Hind-Ewrûpî jî bi lêkolîn û metodên zanyarî hêdî derdikeve holê.

Bi navê P. O. Lindström, di 15'ê adara 1996'an de, di rojnameya Metro de, (Metro rojnameyekî rojane ye li Stockholmê der tê) bi sernivîsa "Koka Swêdiyan li Ukraynî ye" nîvîsarek hat belavkirin. Lindström, di vê nîvîsara xwe de dide zanîn ku di van salêne dawîn de, lêkolînvanen ku li ser bingehê koma zimanê Hind-Ewrûpî dixebeitin, êdî hinek tiş zelal dîkin û ew digîhin encameke berbiçav. Wekî ku tê zanîn, heta berî niha, der barê cografya û temenê koma zimanê Hind-Ewrûpî de, çend teorî hebûn. Hinekan digitin, zimanê Hind-Ewrûpî li Mezopotamya, hinekan digitin li Anatoliyê hinekan digitin li Kafkasya û hinekan jî digitin li Ewrûpayê pêk hatîye û pişt re li Ewrûpa û Asyayê belav bûye. Lî, lêkolînê zanyarî ku di van salêne dawîn de pêk hatîn, rî li pêş texmîn û teoriyên cuda digire û rewşa wê ya bi mij û moran zelaltır dike.

Ev çend sal in ku, di navbera çiyayê Ural û Karpatan de, di vî warî de lêkolîn arkeolojik têne kîrin. Di van lêkolîn û legerînan de, li rojavayê çemê Dînyaperê, hinek cih û warêne kevin derketin holê. Ev cih û war nêzîkî bajarê ku niha jê re dibêjîn Dereivka ne. Li wê herêmê 6 hezar sal berî niha ji qamîş û textikan mal û gundêne ku çekirine derketin holê. Gundiyen wê demê mange (çelek), mîh, beraz û hesp xweyî kirine, masî girtine. Lî, li gorî lêkolînan cara pêşî kîteyên (heceyên) zimanê Hind-Ewrûpî li vir hatine afirandin û bikaranîn. Ev herêm berfireh e. Ji çemê Dînyaper heta yê Volgayê dide ber xwe. Ev zimanê Hind-Ewrûpî, di vê herêmê de derketiye holê. Ew gelê ku di navbera çemê Dînyaper û Volgayê jîyane, pişt re ber bi rojhlat û başûr û rojava ve belav bûne. Li gorî dîrokzanan, jixwe kurd jî, di wê demê de, di ser Kafkasya de, ber bi Zagrosan hatine.

Her wiha li vê herêmê antropolan serê hespekî jî dîtine û di diranê wî de cihê kursandina gem heye. Wiha diyar dibe ku cara pêşî mirov li vir, hesp gem kirine û lê siwar bûne.

Di van lêkolîn herêmâ Dînyaperê de, gelek peyvîn wê demê derketin holê ku hinek jî wan niha jî, hîn di gelek zimanê Hind-Ewrûpî de, hene an jî guhertineke biçük di tûp û kîteyên wan de çêbûne. Ji wan çend ên ku hîn jî di paraniya zimanê Hind-Ewrûpî de têne bikaranîn wiha ne. Bî (björk), xelk (folk), xicîk (wîk) ku tê wateya gunê biçük, quncık (horn-corn), stêrk (stern), rovî (rev), hesp (hest)...

# 'Em ne li derveyî têkoşîna gelê xwe ne'

**E**z dixwazim hûn pêşî, ji dîrokê dest pê bikin û rewşa iroyîn a jinan –ne tenê ya jinê kurd bi tevayî binirxîn. Ango di her konaxa civakê de rola jinan çawa bû?

**Fatma**— Ez dixwazim pêşî vê vebêjim ku, di Rozayê de kî hene, kî wê derdixin, ew tiştekî çawa ye. Ji ber ci ez wişa dibêjim, wexta wisa be, wê maneya pirsa te jî başdır were fêmkirin. Em niha şes jin in ku, vê kovarê derdixin. Em şes kes jî –niha du heb ne li vir in – li ser pirsa jinan em gişt ne di eynî dîtinê de ne, em ne homojen in. Hin ji me femînist in, hin ji me welatparêzên femînist in, hin ji me jî sosyalist femînist in. Lî belê em tev bi imza û navê xwe, fîkrê xwe di kovarê de dinivîsinin. Ev serbestiya pêşîn e di nav me de û me tevan ev yek qebûl kiriye. Lî belê em çawa hatine ba hev? Em jin in û em kurd in. Yanê li ser jinbûn û kurdbûnê em hemfikir in.

**Min dixwest ku hûn li ser tarîxa jinan bisekinin.** Yanê idiaya we jî –tevî hin kesan – ew e ku iro jiyan bi ideolojiya desthilatdar a mérân ve têr meşandin. Lî belê li gorî hin dîtinan beriya vê, jin desthilatdarén jiyanê bûn.

**Fatma**— Kê dîrok nivîsiye, li gorî xwe nivîsiye. Mesela li gorî sosyalistan, berê civaka komûnal hebûye û di vê cîvakê de jin serdest bûne, yanê maderşahî (matriarkal) bûne; pişt re jî bû pederşahî (patriarkal). Sosyalistan, dîroka jinan li gorî ideolojiya xwe nivîsandine. Femînistan jî dîroka jinan bi awayekî din nivîsandine û burjûvayan jî bi awayekî din. Li gorî vê, sê dîrok derdikevin holê. Yanê di dîrokê de gelek problem hene, hin ji ber nezanînê, hin jî ji ber xeletiyê qestî çebûne. Ji ber vê yekî mîsyoneke kovara me jî ew e ku, dîroka jinan derxe rastê; bi taybeti jî ya jinê kurd.

**Dilşâ**— Esas ev dîroka jinan jî, wekî ya jinê kurdan e. Yanê her du jî nehatine nivîsin. Wexta ku jin derketine ser qada dîrokê, ew jin an hatine kuştin, an jî gotine “ev cazû ye” û ew şewitandine. Yanê nexwestine jin bikevin dîrokê. Dîroka jinan wîndâ ye. Ji bo vê jî em dixwazin dîroka jinan binin meydanê. Em dibêjin di dîrokê de tevî mérân, jin jî heñe. Mesela li İngiltereyê di sedsalâ 17'an de, jin jî bo parastina heqîn xwe derketine kolanan û şer kirine. En Fransayê jî, beriya şoreşê, tevî mérân têkoşînê dane, lê pişti şoreşê tu heq nedane wan. Dema pêdivî bi jinan hebe, dibêjin “Werin, hûn rind in, hûn xurt in”, lê dema pêdiviya wan namîne dibêjin “Herin mala xwe”. Mesela gelek jin jî ber vê yekî şandine ber giyotînê. Bi kurtasî dîroka jinan wisa ye.

**Civaka kurd diguhere, pê re jî tevgerên ramanî yên cihê cihê dikevine nava vê civakê. Ji aliyeke ve, bi hezaran jinê kurd bi gerfilatî di milê mérê kurd de têkoşîna çekdarî dide, ji aliye din ve jî, hin jinê kurd li dora kovarekê têne ba hev. Xwe bi awayekî din ifade dikan. Hevala me AYNUR BOZKURT, bi Heyeta Weşanê ya Rozayê re hevpeyvîneke cihêreng pêk anî.**



**ROZA:** Kovara Jinê kurd e. Hejmara yekemîn a vê kovarê ji aliye şes jinê kurd ve, di destpêka meha adarê (1996) de hate weşandin.

Ev kovar ji du mehan carekê wê derkeve. Lewre jî hejmara yekemîn wekî hejmara adar û avrêlê derket. Pîvanê kovarê jî 24.2 x 16.6 cm. in. Tê dîtin ku pîvana wê, ne mîna yên kovarê ji rêzê ne û kovar ji 36 rûpelan pêk hatiye. Tê de tevî nivîsên bi tirkî, nivîseke bi kurdî jî heye.

**Fatma**— Mesela li Tirkîyeyê tê gotin ku, “Me mafî siyasi, heqî reyavêtinê û bi hiqûqa medenî, me tişten pir baş dana jinan, lî belê ew nizanîn wan bişixulîn”. Ev derew e tabî. Yek; çawa derew e? Dema ev qanûn derxistin, dixwestin ku Ewrûpa ji wan re bibêje “Hûn baş in”. Ji ber ku li gorî demokrasiye ev gerek bûn. Wê çaxê navbera wan bi Sovyetê re jî xweş bû. Yanê pragmatist bûn ew. Derdê wan ne jin bû. Parlamentoye çawa jin xiste wê derê, mérân li gorî dîlîn xwe liste çedikirin û ji zilaman re dişandin, digotin bila jina we were û bibe parlamente.

Wexta derbas bû, jinê li Tirkîyeyê, ne tenê tirk; çunkî ermêni, cihû (mûsevî), laz û kurd tev de hemwelatiyê Tirkîyeyê bûn, van jinan giştan li gorî xwe, kêm zêde têkoşîn dan û iro hatin vê merhaleyê. Hin kes li cihê xwe rûdinin, dibêjin “Wele aqîlê jinan kêm disixule, ew nikarin tiştekî bikin”, hin kes jî dibêjin, “En ku bixwazin dikarin werin her derê, pêşîya wan vekirî ye” û ji me re

mîsalan didin, dibêjin filan kes wa ye bûye seroka komara Tirkîyeyê. Ku tu li Tirkîyeyê binêri ji nifusa wê 30–35 milyonê wê jin in. Ji nav 30–35 milyonî 4–5 jin derdixin pêş, ew jin jî bixwazin naxwazin dibin ci, dibin vitîn. Wexta wisa be, ew jî wekî zilaman hereket di-

**Canan**— Dibêjin Serokwezîra Tirkîyeyê jin e û diçe her derê. Lî di qanûnê de jî heta salê dawîn, bêdestûra mérân, jinan nikaribûn bişixulîn jî. Ev hemû tişten şeklî ne. Heta di pirtûkên ku li mekteban didin xwendin de, tê gotin ku “Reisê malê mér e, dê li malê xwarinê çedike, zarokan çedike û li wan dînihîre. Bay li derve dixeble û pere tîne malê, dayik jî karê malê dike.” Ev mînak, bi temamî tesîrî li jiyana me dike.

**Fatma**— Di qanûna cezayê ya tirk de madeyeke bi hejmara 438'an hebû, dihat gotin ku jinik fahîse be û lê tecawiz bê kirin, cezayê kesê sûcda kêm dibe. Ev qanûn bi têkoşîneke xurt hate guherin.

İro bi giştî, insan gelek reaksiyonê li hemberî femînîzmê nîşan didin. Li gorî we femînîzm ci ye û ev reaksiyon jî ber ci ye?

**Fatma**— Wexta ku komünîzm jî hê nû derket, her kesî digot qey, jin û mîr gişt bi hev re radikevin, dê û bavê xwe nas nakin û nizanîm ji komünîstan re ji digotin qey du pozê wan, sê çavêwan hene û bi dûvîk in. Ev ji ber nezanînê dibê tabî û tiştekî din jî heye, idêoloji heye li ortê, menfeet heye. Yanê ji ber van du sebebän jî, ji femînîzm jî hez nakin. Yek, ji aliye fikir ve li dîjî wê ne, dizanîn ku femînîzm jî bo jinan tiştinê baş dibêjî, ev ji zilaman re tiştekî nebaş e. Ji bo ci? Lewre zilam naxwaze otorfiteya xwe winda bike. Ji ber wê jî li ser femînîzm jî tişte xelet were ber devê wan, dibêjîn. Tiştekî din jî heye ku, ji femînîzm re dibêjîn, ji bo jinan azadiya sekse ye. Gelek însan wisa fêm dikan. Mesela li Tirkîyeyê an jî li Ewrûpayê ku femînîzm ewili li wir dest pê kir, kesî qala azadiya seksizmê nekiribû. Dû re, dû re ev çebû. Pêşî li Ewrûpayê, dû re jî li Tirkîyeyê. Li ser femînîzm wisa difikirin ku, jin dixwazin ku her roj, her roj hema ji kîjan zilamî re kîfa wan were, pê re bigerin û pê re rakevin. Ev ne tiştekî rast e.

Hûn ci ji femînîzm fêm dikan? Ji ber ku li ser femînîzm divê fikra we ya hevpar hebe, ne wisa?

**Dilşâ**— Femînîzm ji fransızî tê. Femîn “jin” e, bi wateya rastir ‘mî’ ye. Mirov dikare bibêje, femînîzm hereketa jinan e. Lî dîsa jî ez fêm nakim mîr cîma ewqas reaksiyonê nîşan didin li hemberî femînîzm. Ez wisa difikirim ku ew, ji jinan ditîrsin. Ew dibêjîn femînîst lezbiyen in, femînîst fahîse ne û her tişten xerab difikirin, lê maneya wê nizanîn û naxwazin bizanibin jî. Femînîzm hereketa jinan e yanê idêolojiya serxwebûna jinan e.

Wisa tê bawerkirin ku, di nav keşen têkoşîna femînîzm didin de, mîr cihagirin. Jin bi serê xwe ne û jin ji xwe re civakeke din wê çêkin û ji mérân veqetin. Li ser vê hûn ci dibêjîn?

**Dilşâ**— Nîha tiştek wisa tune ye. Lî femînîzm ji hev vediqete û dibe çend parce. Mîna; liberal femînîzm, radikal femînîzm, sosyalist femînîzm, marksist femînîzm, lezbiyen femînîzm, femînîzma reş û hwd. Ev gişt cureyên femînîzm ne. Femînîzm bi serê xwe wekî silwanekê (yelpazeyekê) ye. Mesela hin ji me, ji xwe re dibêjîn “Em sosyalist femînîst in.” Temam em femînîzm diparîzin, lê di nav sîstema sosyalist de û tevî mérân divê em bixebeitin. Çunkî li dînyayê, du zayend hene; jin û mîr. De-

**Bi taybetî di çarçoveya  
pirsgirêkên jinê kurd de  
em hatin ba hev.**  
**Lê ev nayê wê maneyê ku,  
têkoşîna gelê kurd a ji bo  
rizgariyê, li dûrî me ye  
an jî em li derveyî wê  
têkoşînê ne. Ev divê baş  
were zanîn ku em gelek  
girîngiyê didine vê xebata  
xwe û dixwazin ku ji îro ve  
jinê kurd hişyar, gihîştî û  
zane bin. Lê em çiqas  
girîngiyê bidine karê xwe  
jî, em ewqas girîngî didine  
têkoşîna rizgariya  
gelê xwe jî.**

ma mîr jî neyê perwerdekirin, guherti na civakê jî ne mimkun e. Em bi xwe nafikirin ku tenê jî jinan civakekê pêk bînin. Lê hin radikal femînist hene ku wisa difikirin, êdî ew jî terciha wan e.

• *Li gorî we mimkun e ku civakek, tenê jî jinan pêk were?*

**Dilşa-** Na. Em ne di wê baweriyê de ne. Lî mîna ku min got, hin radikal femînist hene, ji xwe re kooperatifan vedikin, mala jinan vedikin, lê ew marjînal in.

• *Hûn vê gavê şeş kes in ku vê kovare derdixin. Li gorî ku ez dizanim, di nav we de kesen ku eleqeya wan bi rexistinan re hene jî, hene...*

**Fatma-** Na. Em gişt jinê serbixwe ne. Fikra me heye tabî, fikra me ya politîk. Lî di nav me de ferq hene. Fejet ji aliyê politîk ve jî em ne girêdayî tu partiyê ne.

• *Îro, hem ji bo rizgariya kurd û Kurdistanê, hem jî, ji bo sosyalîzmê têkoşînek tê dayîn. Gelo hûn ne bawer in ku wê jin di sîstema sosyalist de xwedî mas bin û bi mérân re wekhey bibin?*

**Fatma-** Em dibêjin, sosyalîzma ku beta vê gavê me dît, yanê tu ji Marks dest pê bikî, 150 sal derbas bûye, em di-

nêrin ku li ser helkirina meseleya jinan tiştekî zêde nehatiye kirin. Wê çaxê em dibêjin ci? Hin welatên ku berê bindest bûn, dû re serbixwe bûn jî, wekî Cezayîr, Angola, Nîkaragua û Yekîtiya Sovyetê, tevî ideolojiyê, di pratîka wan de jî kîmasî hebûn. Ji ber wê, jin divê ji bo rizgariya xwe bişixulin û tê bikoşin. Niha mîsyona Rozayê ya ewîlî, ne ew e ku Kurdistanê xelas bike. Jixwe nikare jî. Em bibêjin jî tiştekî xelet e. Ji bo ci? Çunkî ev karê partiyen e. Em dixwazin ku partiyen Kurdistanê, li ser jinan projeyan derxin, bibêjin ku wexta Kurdistan xelas bibe ji bo jinan emê van tiştan bikin. Ku sibe Kurdistan xelas bibe wê kî were iktidarê, wê partiyen me werin û parlamentojê jî ava bikin. Em jî dixwazin wekî jinê serbixwe ji wê parlamentojê re deklerasyonê pêşkêş bikin. Niha tu dikarî xebata me wekî sendika-

yê bifikirî. Yanê wekî sendîkayeke xweser bifikirî.

**Canan-** Sosyalîzm ji bo insanan ideolojiya herî bas û rast e. Wekî ku me got sosyalîzmê ji bo xelasiya jinan zêde tiştek nekir. Jin belkî di sosyalîzmê de, li gorî feodalîzmê û kapitalîzmê bêhtir rehet bûn. Lî jin xelas nebûn. Derdê wan jî neqedîyan. Bi temamî jî neketin siyasetê. Yanê di mekanîzmaya qerarê de cihê xwe nestandin. Me ev dit, me ev xwendin û me pratîka Sovyetê, pratîka Cezayîr jî me dît. Bi taybetî jî rewşa Cezayîr geleksîneke pir mezin lazym e. Wexta meseleya kurdan jî di 60'î de dest pê kir, ci hebû li holê? DDKO hebû, çend heb pirtük hebûn. Ev 30-35 sal derbas bûye û em hatine ku derê. Berê çepa Tirkîyeyê jî tew bi kurdan re nedîpeyivîn, lê îro tu dibînî ku tev qala kurdan dikin. Ev cawa bû? Ji ber têkoşîna kurdan wisa bû. Em vê baş dizanim ku, divê em ji cihekî dest pê bikin. Jinê kurd bûne 15-20 parçê, li Ewrûpayê, li Tirkîyeyê, İranê, Sûriyeyê, İraqê û hwd. belav bûne û ji hev dûr bûne. Ji ber wê, bi alîkariya Rozayê em dixwazin dengê xwe bikin yek. Ji xeynî kovare jî di rojîn pêş de, girêdayî rewşa kurdan, emê li gorî qeweta xwe tişten din jî bikin.

Li wir kîmasîyek hebû, belkî sosyalîzm li wê derê tune bû lê, yê me, derdê me sosyalîzm e jî. Belkî sosyalîzm riya xelasbûna jinan veke, lê ez bawer nakim ku hemû probleman çareser bike. Li vir wezîfeyen mezin dikevin ser milê jinan û divê vê wezîfeyê jî nehêlin ji rojîn li pêş re. Nehêlin heta xelasiya kurda, xelasiya welatê me û sosyalîzmê. Ev xebat ne li dijî mérân e, ne jî li dijî sosyalîzm û partiyen e. Ji bo vê jî hereketa jinan divê serbixwe be û ne di bin siya partiyen de be.

• *Di niviseke kovare de, pirtûka ku Birêz Abdullah Öcalan, a ku der heqê malbat û jinan de nivisiye, tê rexnekirin. Tê fêmkirin ku Birêz Öcalan ji ber ku mér e û li ser meseleya jinan sekiniye, reaksiyonek hatîye nîşandan. Gelo gorî we mér nikarin li ser vê meseleye bisekinin?*

**Fatma-** Ez dixwazim vê hînekî din jî vekim. Di wê nivîsê de tê gotin ku heta vê gavê zilam li ser meseleya jinan sekiniye, ji fro pê ve em dixwazin kulê xwe em bi xwe binivîsin. Ev ferqeke mezin e. Mesele ne ew e ku, zilam bila nenivîsin û zilam ne tiştek in. Jixwe dema zilam jî neyêne guherandin, civat nayê guherandin, dinya nayê guherandin. Em xwe bi xwe werin guherandin jî ev têri nake.

**Dilşa-** Mînakeke din mirov dikare

bide. Ew dişibe vê yekê, mîna tirk mafê kurdan biparêzin. Dema tirk ji bo kurdan pirtûkan binivîsin çawa ye, ku kurd bi xwe vê pêk bînin çawa ye? Ev mesele jî tiştekî wisa ye.

• *Bi weşandina vê kovare, gelo çiqas ew ideolojiya desthilatdar a mérân biguhere? An jî wekî din hûn tiştekî din difikirin ku bikin?*

**Fatma-** Hûn takdir bikin ku ev kovar nikare civakê bi temamî biguherîne. Ji ber vê yekê têkoşîneke pir mezin lazym e. Wexta meseleya kurdan jî di 60'î de dest pê kir, ci hebû li holê? DDKO hebû, çend heb pirtük hebûn. Ev 30-35 sal derbas bûye û em hatine ku derê. Berê çepa Tirkîyeyê jî tew bi kurdan re nedîpeyivîn, lê îro tu dibînî ku tev qala kurdan dikin. Ev cawa bû? Ji ber têkoşîna kurdan wisa bû. Em vê baş dizanim ku, divê em ji cihekî dest pê bikin. Jinê kurd bûne 15-20 parçê, li Ewrûpayê, li Tirkîyeyê, İranê, Sûriyeyê, İraqê û hwd. belav bûne û ji hev dûr bûne. Ji ber wê, bi alîkariya Rozayê em dixwazin dengê xwe bikin yek. Ji xeynî kovare jî di rojîn pêş de, girêdayî rewşa kurdan, emê li gorî qeweta xwe tişten din jî bikin.

• *Dema we kovare derxist, ci problem derketin pêşîya we?*

**Fatma-** Me gelek zehmetî dîtin, lê tevî tişten xweş. Der dorêne me gelek piştgirî dane me. Tabî ji bo derxistina weşanekî, pere gelek muhîm e; kaxiz, çapxane, montaj û hwd. Tev bi pere hel dibin. Ein şeş kes, ci pere di bêrîka me de hebû me tev danî holê û di nav xwe de me ev mesele hel kir. Me dixwest ku bi keda xwe em vî işî pêk bînin û wisa jî çebû. Ji bo temîkirina pereyê me ji tu cihi jî alîkari nestand. Nivîsarên kovare jî me bi xwe hazir kirin.

Heta hevaleke me ya destekî wê kop e, tenê bi destekî nivîsene me derbasî kompîtûrê dikir. Bi roj kesen xwendekar diçûn dibistanê û yê din jî diçûn karê xwe, bi şev jî heta sibehan ji bo kovare em dixebeitîn. Tevî van xebatan hin saziyan jî, ji bo pêkanîna xebata me, deriyen xwe jî me re vekirin. Em spasdarê wan in jî. Gerçî di kovare de, ji ber ama-

toriya me, her çiqas kîmasiyen me derketibin jî, di hejmara dudyan de em dixwazin ku van kîmasiyen hindiktir bikin.

**Canan-** Bi vî rengî kovarek, di dîroka bakurê Kurdistan û Tirkîyeyê de carâ yekemîn e ku derdikeye. Ji ber wê yekê me got bila derkeve û destê jinê kurd bigihîje hev û din.

• *Derxistina kovareke bi vî rengî, ci ji aliyê jinan, ci jî ji aliyê mérân ve, çawa hate nirxandin?*

**Fatma-** Nêzîkbuyma insanan bi temamî gelek xweş bû. Em jî hînek şas man li hemberî wê. Tabî hin kîmasiyen ku di kovare de hebûn, ji me re hatin gotin, lê bi awayekî dilxwes, kovar hembêz kirin. Heta hin kes bawer nekirin ku me bi serê xwe ev kovar derxistiye. Di gotin qey hin kes li pişta me hene. Lî tabîkî ne wisa ye.

• *Mér jî dikarin gelo di kovara we de her tim binivîsinin?*

**Fatma-** Di hejmara yekemîn de jîxwe nivîsâne. Lî bi şertê ku mîr jî jinan zêdetir nenivîsinin. Ji xeynî vê ji bo me jin û mér, tirk, ermîn, kurd û hwd. ferq nake. Tenê divê nivîsene wan, hêjâyî weşandinê bin.

• *We çîma bi jinê kurd ên femînist re, an jî jinê ji gelên din re yekîtiyekê pêk neanî? Tenê jinê kurd...*

**Fatma-** Jinê kurd ên femînist wekî ku kurd tune ne, hereket dikin. Ne ew der heqâ jinê kurd de tiştekî dinivîsin, ne jî em dikarin ji wan re binivîsin. Wexta ku em ji wan re dinivîsin, qala kurd û Kurdistanê dikin, ew der tênsurkirin. Çunkî di hiqûqa tirkan de jî ev qedexe ne û ew jî naxwazin berdêla têkoşîna xwe bidin. Ji ber wê jî me xwest ku em tenê jinê kurd werin bahev.

• *Wekî din tu gotina we ya din heye gelo?*

**Canan-** Em gelek spas dîkin ji rojnameya we re jî, ku cara yekemîn e rojnameyeke bi kurdi bi me re roportajekê dike. Em gelek kîfxwes bûn û we em şanaz kirin.



# Ne tenê şâîr, kana çandê ye jî

# Cegerxwîn

Gava ku mirov li nava  
gelê kurd digere  
bi armanceke lêkolînî,  
tavilê ev navê nemir têñ  
hemberî mirov:  
**Seydayê Cegerxwîn**  
û Mûsa Anter. Di navbera  
**Seydayê Cegerxwîn**  
û Apê Mûsa de  
pireke zexim hatiye  
avakirin. Em jî lêkolînerên  
ciwan niha di ser vê pirê  
re dimeşin.



Cegerxwîn û folklorîstê kurd Ordixanê Celil

**C**egerxwîn ne tenê ji bo gelê kurd şâîrekî mezin û navdar e, ew bi xwe rîzanelekî hisyar, zana, rewşenbîr, pêşewa û têkoşerekî xurt e jî. Seyda bi xwe ji bo gelê kurd berhevkarékî herî mezin e jî. Di vê nivîsa xwe de bi taybetî ezê li ser hêla wî ya berhevkarîyê bisekinim.

Gava ku mirov li nava gelê kurd digere bi armanceke lêkolînî, tavilê ev navê nemir têñ hemberî mirov: Seydayê Cegerxwîn û Mûsa Anter.

Gel, Apê Mûsa bi Anterî nas dike. Gava ku şehîd bû, bû Apê gel. Niha hezkirina gelê kurd li hemberî van keşan ji vê derê tê: Her du jî, bi taybetî di qada berhevkirina zargotina gelê kurd de, rewşenbîr û lêkolînerên gelekî mezin in. Tê xuyakirin ku mirov çiqas bi nîrxên gel eleqedar bibe, gel jî ewqas mirov nas dike. Bi kurtayı di navbera Seydayê Cegerxwîn û Apê Mûsa de pireke zexim hatiye avakirin. Em jî lêkolînerên ciwan, niha di ser vê pirê re dimeşin.

## Cegerxwîn û folklor

Mamoste Cegerxwîn di vê qadê de, bi navê Folklorâ Kurdî berhem daye û pirtûkeke wî hatiye weşandin. Ev pirtûk di nav weşanên Roja Nû de, di sala 1988'an de li Stockholmâ Swêdê derketiye.

Mijarên pirtûkê ev in:

**1-Helbest û Birdîlan:** Helbesten li ber govend û dîlanê têñ gotin dikeve vê besê. Weki: Ez Kevok im lê.., Ax û Aman Gulê, Emoşê, Sultanê..

Mamoste di vê besê de 64 helbest dane hev. Her helbest ku ji terefê kê hatiye gotin, navnas kiriye û helbest jî şirove kiriye. Di nav van helbestan de yekê bala min kişand:

### KEMALO

*Kemalo, Kemalo, wer wer Kemalo  
Min çavê serî xwaro, wer wer Kemalo  
Kemal bavê me tê, wer wer Kemalo  
Reyisê cumhuriyetê, wer wer Kemalo  
Şêxê şerfetê, wer wer Kemalo*

*Kemal bi kêri me tê, wer wer Kemalo  
Kemal go ez nakim, wer wer Kemalo  
Sulhê qebûl nakim, wer wer Kemalo  
Şêxan ji vir rakim, wer wer Kemalo  
Axa ji vir rakim, wer wer Kemalo*

*Kemalo rézan e, wer wer Kemalo  
İsmeto rézan e, wer wer Kemalo  
Çarox girê dane, wer wer Kemalo  
Şerê wî li ser Yewnan e, wer wer  
Kemalo  
Şerê wî li ser Yewnan e.*

Em binêrin Mamoste çawa şirove kiriye:

"Her weki tê xuyakirin, kurd herdem dilxwaz û dilbijokê mirovên mîr û gernas in, meger dijmin be jî û heta li ser dijminên xwe jî, dibêjin û pesnê wan didin. Ji ber ku nexwendî û nezan û bêbîr û bawer in, nîzanin welatperwî ci ye. Tenê zanîn ku misilman in û dewleta ku di bin destê wê de dijîn, dewleta xwe dihejinêrin. Ev helbesta ha nişana nezanî û lipaşmayina wan e, ku bi sed hezaran ji kurd kuştine û hêjî

dibêjin "Kemal bavê me ye."

**2-Berdan:** Helbesten ku, li ber conî gava ku dan dikutin, dikevin vê xalê. Mamoste 4 helbest dane hev. Lîne ewqas tenê ye.

**3-Berdestarî:** 7 helbest hatine berhevkirin.

**4-Berbûkî:** 3 helbest hatine berhevkirin, lê hîn bêhtir in. Ev dûrik gava ku bûk ji mala bavê wê derdixin, tê gotin. Pîrek dibêjin. Mînak:

*Hatin te yo, hatin te yo  
Bikin kar û barê xwe yo  
Lê lê camin û xaminê  
Hésir û girî bêfêde yo.*

Gava ku bûk derdikeve, diya wê bi hêşir û girî bîriyê dike. Lewma dayik desteka xwe winda dike.

**5-Stran û lawik:** Mamoste Cegerxwîn, ji bo stran û lawik pêşgotinek daniye:

"Bê kêşan e, lê tenê bi dawî ye. Herwekî hin peyvîn wan dirêj, hin jî pir kin in. Ji lewre gelek caran dengbêj van kurtebeytan hin caran bi hê hê an lo lo, lê lê dadigirin. Lî divê mirov ji bîr nekin ku di van stranan de hin gotin û daxwaziyênil bilind û peyvîn ciwan û giranbuha têne dîtin û gotin ku ristevan jî nikarin di nav ristên xwe de wilo bêjin.

Ji lewre hin xorîn nû hatine, dixwazin ristê jî weki stranên serbest bikin û guh nedîn kês û dawiyê. Di awira min de ev jî, ji ber çend tiştan e:

- Bi xwe ne yêñ sisteman in, nikarin

ristê bi kêşan û dawî çêbikin

- Baş bi zimanê kurdî nizanîn
- Bi kurdî baş nexwendine
- Gelek dilbijok û ristevanî ne, lê nikarin ristê baş çêkin.

Tenê tiştek heye ku nayê veşartin ku ev reng ristên klasikê kurdî, wê rojekê ji welatê me jî winda bibin. Lî kengê welatê me bikeve konaxa dezgevaniyê û aboriya welêt ber bi pêş ve here ku heta ser xweş karibin van ristên bêkêşan û dawî bibêjin. Lî di iro de ev ristên klasikî bi müsikê, ji gelê kurd re bêhtir bi kêr ve têñ, ji ber ku kurd û hemmû miletê lipaşmayî bêhtir ji müsikê hez dikan."

Di besê stran û lawikan de 3 stran hene. Bazo qurban, Bavê Seyro, Bavê Behçet.

**6-Lavij:** Di vê besê de Mamoste ev helbest dane hev: Bavê Fexriya, Hesennê Mûsa, Xerabo, Delalê Beriyê, Feqî û Eysanê, Wî wî li min, Besna Xelîl, Eysana Mîrza Begê û Gewrê.

**7-Lavijê Botan:** Du helbest cih direğe di vê besê de, bes Mamoste balê dikişine ser piraniya gelek helbestan ên di vî warî de. Her du helbest ev in: Lavijê (lawik) Botan û Esmer û Gewra

**8-Serpêhatî:** Mamoste Cegerxwîn, di wêjeya kurdî de ji serpêhatiyan re dibêje "Avêtina ser" jî. Em binêrin ka ramânî wî di vî warî de ci ne.

"Daxwaza me ji nivîsandina van "Şer û serpêhatî" û di stranen de ev e, ku em karibin sergêjî û bextreşiyênil miletê kurd deynin berdestê wan mirovan, ku dixwazin di pêsiya miletê xwe de



**Li NAVENDA** Çanda Mezopotamyayê vê heftiyê ji çalakiyên çandî û hunerî hene. Her wiha semînera Enstîtuya Kurdi ya li ser guherîn sosyolojik ên li Kurdistanê û semînera bi navê "Nazîm Hikmet û kurd", li navenda saziyê tûn pêkanîn. Ji aliyê din, konseren muzikê û komîn NCM'ê ji di çalakiyên vê heftiyê de cih digirin.

● **24.03.1996 Yekşem**

Demjimêr 14.00 Semîner (Nazîm Hikmet û kurd), Axaftvan İsmail Göldaş.

Demjimêr 18.00 Konsera muzikê ya Fevzi Kurtuluş

● **27.03.1996 Çarşem**

Demjimêr 18.00 Konsera muzikê ya Koma Rojhîlat (NCM)

● **29.03.1996 În**

Demjimêr 18.00 Konsera muzikê ya Erensoy Akkaya

● **30.03.1996 Şemî**

Demjimêr 10.00 Konferansa Enstîtuya Kurdi, ya bi navê "Li Kurdistanê Guherîn Sosyolojik"

Axaftvan: Dr. Cemşît Bender (dîrokzan), Apê Torî (lêkolîner, nivîskar), İsmail Göldaş (nivîskar), Dr. Sungur Savur (nivîskar), Münir Ceylan (sendîkavan, nivîskar)

Demjimêr 18.00 Konsera muzikê ya Efkan Şeşen.

## RÛDAN

çend gavan di meydana rêzaniyê de bi pêş de biavêjin, da ku karibin rêberiyen milete xwe bi rast û durist nas bikin û ca-reke din ji, nekevin nav çirava çewti û şâsiyan; da em karibin bidin zanîn, ku milete kurd ji kevnarê de, di Kurdistanê de bi gernasî li ber xwe daye û serê xwe ji kesî re daneniye, her wekî dibêjin 'He-ta serê xwe nedaye şikandin, baca xwe nedaye.'

Her wekî em dixwazin folklorêن xwe yên kevnar di vê nivîstê de bi dervekin û ji nav toza windabûn û guhne-danê, van gewheran paqîj bikin û di nava rûpelên tarîxê de bidin xuyakirin, ku di nav zimanê cîhanê de cîhekî bilind û hêja bistînîn. Ma gelo em ne mirovêن ku karibin vî barê giran hilgirin an di bin de rabin?"

Mamoste Cegerxwîn ji nava gelê kurd de ev serpê-hatî berhev kirine: Ehmedê Hecî Evdila, Kuştina Seîdê Ehmed, Ehmedê İskan, Ser-pêhiya Bişarê Çeto, Cemîlê Çeto, İsanê Qasim, İsmailê Xelîl, Bavê Behçet, Tahir-xanê Cezê, Tacidînê Hecî Osman, Sadûnê Axê Omeriyan, Suleymanê Emer, Seîdê Nado.

### Li ser zargotinê, ramanê Cegerxwîn

Li gorî Mamoste Cegerxwîn folklorâ

kurd û zimanê wî gelekî dewlemend e. Her wiha Cegerxwîn balê dikişine ser zaravayê kurmancî: "Di vê meydanê de zimanê kurdî zaravaya kurmancî gelekî dewlemend e, mezîn û payedar e. Ji her nevî helbestê lawîk, heyran, destan, ser-pêhatî, çîrok û lîstik dagirtiye."

Li gorî Cegerxwîn, di vê qadê de, lê-kolîn heye ku hê ji sedî bîstî çênebûye û tiştê ku çêbûye ji zehf qels e. Cegerxwîn wisa diaxive:

**Baş tê xuyakirin ku zaravayê zimanê kurdî çîqas ji bo çand û hunera gelê kurd mîna moza-yîkekê be ji, niha ji bo yekîtiya zimanê neteweyî astengek e ji. Ev ji li hember lêkolînvan û zimanzanen elşikeke neteweyîye.**

xêzan, di nav çend dewletan de hatîye parçekirin û hemû ji nahêlin heta em bi zimanê xwe tiştekî bibêjin û ji hawîrdor, zor û sitem wekî him û latan bi ser pişta me dihatin berdan û nikarin bi hêsanî xwe ji bin giraniya wan derbixin û ji zîndanê wî xelas bikin. Derfet bi dest me naakevin. Kesên xwendî-derfet ji ne tenê çekûs in, pera nadîn, belki şerê me bi hovîti ji dikin."

Lê Mamoste, qet hêviyêن xwe naşikîne û li xwendevanan û lêkolîneren ciwan, bangeke dîrokî dike:

"Xwendevanê delal, çendî ku ev nivîstê me ne di rêza ni-vîstê xelkê de ne ji, lê gelek bawer im ku hûnê di van nivîst û nivîsaran de pir nivîstê hêja, şayan û şabaş û afîrînê bibînin û bixwînin. Her wekî pir hêvîdar im, ku ewen pişti me re hêj xweşîr û çêtir binivîsin û bêh-tîr pêş ve bibin. Ji ber ku pir hêvî heye, ku çerx û demên we ji yên em tê de, xweşîr û çêtir bin."

Têbinî: Ev raman û nêrinê balkêş yên Mamoste Cegerxwîn di pêşgotina pirtûka wî de, ya bi navê "Folklora Kurdi" di rûpelên 6-7 de cih digirin.

FEREC KÜREŞİVAN

## TÎSK



LERZAN JANDÎL

### Hîrê aşmî

S eke êno zanayene, serê hîrê aşman (serê sê meyan) - Çêlo gîrs/pîl; gujige/gucige; mart/adare-ebi Kalê Gaxanî dest keno ci. Kalo Gaxan aşma Çeliyî gîrsî de virozîno. Şarê ma Kal ebi kîf û eşk, dawil û zurna ebi govende û kay-derbaz kerdêne. Dayê ra dime ji rojê Xizirî ênê. Xizir her rey hîrê rojî yo. Nê hîrê rojan de rojê Xizirî êno guretene, qurbanî ênê kerdene. Cem û cemât êno guretene. Xizir hîrê hetfey tê dime dewam keno û aşma Gujige ra ji di rojan cêno. Nê hîrmîn aşmî lewê şarê ma de zaf bi qîmet û rûmet ê. Ma-nê nivîsi de wazenme aşma martîl/adare ser ro vinderîme.

Na aşme, ha hetê dîroke ra bo ha ji hetê dîn, mîtolojî û torî ra bo, zaf bi qedr a. Ma şîkime kar û gureyê na aşme, edet û toranê na aşme û çiyê dînî û mîtolojîkî yê na aşme hetê ma de estê niya rêz keme.

Qere çarşemê martî: (çarşemo veren ê aşma martî) Danê şodîrî xaşile potêne. Xaşile ebi doyê şîrînî werdene û vatêne: "Wa ez wusarı biwînê, mora mevînê" Xêca şîrînî de hîrê qırşî/darikê temîzê qîjekî ji kerdene zerrê xaşile. Nê darî ke bişiyêne kamî vatêne: "Risqê to zaf o."

Pêco baxçan ra gîlê dara şîlane ardêne. Nê şîlanî verê adîr de kerdêne germin, tewênenê kerdêne xelege. Domanî na xelege ro hîrê rîy vetêne û tey ji vatêne: "Tal û tengê ci esta tey bibiriyo şoro. Jan û jûn bibiriyo. Tal û têngä to bîriyo." Na xelege ke mordemî tiro derbaz biyê bonê çeyî de darde kerdêne. Wunciya şîlane verê adîr de kerdêne germin, seke mordem lak gîrê dano, hêni fek û çimê vergî gîrê dêne. Na şîlane kerdêne binê kemere. Wunciya ebi na şîlane rişê malî gîrê dêne û berdêne gomê malî de darde kerdêne. Silond ze tunelî quele kerdêne tiro qîj û pîlî derbaz biyêne Vatêne: "Nêweşîye, nusbetîye birnena." Hemverê kuxika siyaye darê xeneqo-ge (daroke jû mordemî xo cira darde kerdo û xeneqo) ra jû parçê/şîl guretene kerdêne paç eştenê vilê domanan, ke wa domanî mekuxê. Hawtê Mart: Angorê baweriya şarê ma, na roje de saciya germe kuna binê hardî. Dar û kemer hardî re sejde beno. Darî ebi şewe ênê re sejde. Danê şandî ji ebi banoke ser rê dormê bon û dormê locina bonî de xeleke ontêne. Na xelekeontene şarê manê êzdiyan de ji esta. Kemerê temîzî dere ra ardêne û nê kemerî dormê locine de (ze xeleke) nêne ro, vatêne: "Hela risqê kamî esto?" Çend rojan ra tepiya binê nê kemeran de niya dêne. Lulik ke biwtêne binê kemera kamî, vatêne: "Risqê to esto."

Na roje de zerfetî potêne, xêrê dormanê qijanêke merdê, dêne. Axwe locine ra verdêne dê, wa risqê çeyî zaf bo. Her ciqa ke hetê ma de Newroze ebi name nêna zanayene ji, ez bawar kena na roje, roja newroz a. Çimke na roje de saciya germe kuna binê hardî, dar kemer hardî re êno serjde. Tay kesî ji newê Martî re vanê, na roje Newroz a. La benê na mesela zelal niya. Çimke mesela girêdayî salname/takvî û rojanê aşman a. Ganî na mesela bêro zelalkerdene. Newê Martî: Na roje de xêrê Elî dêne. Na roje de kesêke hişkiyêne qirbane kerdêne. Yan ji zerfetî potêne, venga cîranan dêne. Kesêke halê xo rind nêbî ji loqme potêne cîranan ra kerdêne vila.

Desûhawtê Martî: Na roje ra vanê "hawte martîyo pîl" ji. Ewo xêrê kesanê pîlaneke merdê, dêne. Yanê na roje ji roja xêran biye. Nê çiyanê corênan ra ji xêle eşkera aseno, ke qedr û qîmetê hardî, axwe, demseran, dinya lewê şarê ma de zaf o. Xêr dayene, roje guretene, cem û cemât kerdene, loqme vilakerdene parçêde biyena şarê ma wo. Bê guman ganî sebeb û bingê nê edet û toran bêro asankerdene. Qeyî şarê ma dormê locina bonî de xeleke oncenô? Şarê ma qeyî dara şîlane ra xeleke virazeno? Qeyî Xizirî ra hundê hes keno, rojê dê cêno? ûeb.

*1 Namê aşma Martî latinî ra êno. Yanê qesade latinî ya. Mana xo ji "Heqê Şerî" yo. Şarê kirmancî namê tenê aşmanê ke namê xo kirmancî niyo, latinî ra, namê tayîne suryanî ra û namê tayîne ji sumerî ra gureto.*

## CIGERXWIN




## FOLKLORA KURDI



ROJA NÜ

# Li müşextiyê şeveke dirêj

**"Tu dizanî ci hate bîra min?  
Henek û tinazê hevalê Elî  
hatin bîra min. Heval Elî  
her dem digot: 'hevala  
Sêvê tê bikoşe, xwe  
bigihîne da ku di navbera  
jin û mîran de cudasî  
nemîne. Divê ku mafê mîr  
û jinan yek be.' Dema wî  
wilo digot, tu di bin sim-  
belan re dikeniyayî.  
Elî, hevalekî çiqas  
dilovan û hêja bû."**



**K**amyona tije mirov û hûremûr li nav holekê sekinî. Çawa kamyon sekinî, zaro-kan xwe jê avêt. Bûbû çi-rewîra wan. Birhoyê Mecîd got:

—Kuro mirov dibê qey hûn jî fîrsîka berêz (xenziî) in. De di cihê xwe de rawestin. Çiqas hûn natepitin...

Dema ku wext bû dara eşayê, heft malê ku bi vê kamyonê hatin, hûremûr, kinc û mincên xwe bi cih kirin.

Rîspî û mîrén navsere, li mala Xalidê Elî yê ku berî 19 salan hatibû vê metropola bêqudos, rûniştine. Car ecaran, kalek ji wan û hinekê din dikevin qirika hev. Yê kal digot:

—Bi xwedê, em kurd tu caran nagi-hêne armanca xwe. Ji ber ku em bi hev re xayîn in. Ma komutanê nehiyê ji ku dizanî ku em bi zarakan re alîkîriyê di-kin? Ma leşkerênu ku ji Anadolê hatiye, şikeft û qußen çiyê ji ku dizane? Em xwe bi xwe, malikê li hev dişewitînin.

Yê ku hinekî bi şervanan re danûs-tandibûn digotin:

—Mamo, ev yek di serê hemû gelan re derbas bûye.

Xelîl bi awayekî ken û girî digot:

—Küçikên gund qet ji ber çavên min naçın. Dema ku kamyonê ji gund da rê kûçik li ser dûvî xwe rûniştin û bi hev re zûrezûr kirin.

Xalid got:

—Birayê Xelo, bûyerêne bê ji vê me-zintir hene. Li vê kolana ji me vê de malek heye. Heft kufletê wê bi yekcarî tevlî xanî hatin şewitandin. Bi saloxan, tûman hem agir vêdixistin, hem jî, ji ali-yekî ve jî gulebaran dikirin. Nalînîn zarakan, bi fiqetiqên tîman, hatibûn xe-niqandin.

Zarokênd gundê E... di emrê xwe de hêj evqas şewqa lempayê nedîtibûn. Tî-tetîda qorneyan, serê wan gêj kiribû. Lempayên bajêr wekî stêrikênd gundê wan nedîcîrisin. Pêşîyan (kermêşan) xwe nekire çavên wan. Leşê wan tev bû sorik. Bi neynûkan laşê xwe dixurandin. Xirtexirt ji çermênd wan dihat. Şe-vek wilo bêxew, kûr û dirêj bû.

Dengê lorîkênd dayikan, dengê zîz û melûl wekî ku ji binê bireke kevnare were, fetisî derdiket.

Xelîl cixareyeke stûr pêça. Dema ku cixare dikêsa, serê cixareyê dibû wekî pelesotekî. Ne nalînîn zarokan, ne lorîkênd zîz û bi şewat û ne jî pêşiyên gezok bandor li ser ramanê wî dikir. Wekî yekî nîvmîrî, bêtevger di nav nivînan de raket bû. Çavên wî bi stêran ve cemidî mabûn:

“Gundê E..., zarokatiya min a qermîri, xortaniya min a çargavkî, evîna min a vesartî, hevalen min ên servan, dilgerm, zana û çeleng tê de... Gundekî virt û vala. Heval li serê çiyê û di nav wan daristanêñ xweş de. Niha ez li vir û ew li seriyeñ dinê yên din. Dê çawa be? Hêj nû ne xweş bûbû rewş û jiyan. Bend û fesadî, hev û din kuştin, zikreşî, bexîlî ji holê rabûbû.. Lê em pê şad nebûn. Ew bi me şad nebû”, got Xelîl.

Di menek dihat ber çavên Xelîl û yet winda dibû. Digot: “Gelo zarokênd min dê li van deran perişan bibin, gelo hevalen mîna yên li gund li vir jî hene?”

Mitala wî disa çû ser gund: “Gelo daren gûz û behîvîn me dê hişk bibin, leşker dê wan bixwin, cerdevan dê wan bibirin? Dibe ku heval li wan xwedî derkevin.”

Xelîl hê di nav van fikir û ramanan de bû, bi dengê jina xwe Sêvê hisyar bû. Sêvê gotê:

—Xelîl! Ev sê car in ku, ez gazi te dikim lê tu guh nadî min. Xêr e? Qey tu ji min hêrs bûyi? Tu dizanî ci hate bîra min? Henek û tinazê hevalê Elî hatin bîra min. Heval Elî her dem digot: “Hevala Sêvê tê bikoşe, xwe bigihîne da ku di navbera jîn û mîran de cudasî nemîne. Divê ku mafê mîr û jinan yek be.”

Dema wî wilo digot, tu di bin simbelan re dikeniyayî. Elî, hevalekî çiqas dilovan û hêja bû.

Xelîl bişiri, rûyê xwe ji Sêvê guhert. Qasekî bêdeng ma. Got:

—Sêvê! Dileki min dibê hema rahêje gof û golê (hûremûrên) xwe, rast û rî

berê xwe bide E.... Tîm me dikujin, janderme me dişewitînin, ci dibe bila bibe. Ev şeva mizawir, ev şeva fetisok derbas nabe. Qey hemû şev dê wilo wekî dasiyekî, wekî kulmistekê di gewriya min de bîmîn? Ez dê çawa temenek li vir bîborînim?

Di vê şeva xedar û tijî stêr de, serxeş û tolazên bajêr bi qîr û qîjemîj riya malen xwe digitin. Gurmegurm û hingedinga dengê firokênd ku ji balafirgeha Încîrlîkê radibûn, bêdengiya şevê diqe-laşt.

Sêvê got:

—Rebenê! Çima tu nabêjî ewqas firokênd ku dihatin li ser asîmanê me difirîn û em bombe dikirin ji vir dihatin.

Xelîl got:

—Sêvê, qey em dikarin heta çend rojan di ser zikê Xalê Xalidê Elî de bîmîn? Jixwe ew kom û kuflét in. Em jî li ser pişta wan bibin bar, ew jî dê hê bêhtir perişan bibin. Erê niha havîn e. Mirov dikare li hewşê, li ser banî jî rakeve. Lê zivistan, dê çawa bibore. Ez ni-zanim ev ci şeveke malkambax e. Ev şeveke dû dirêj û bêser û bin e. Heckû destekî zexim dilê min diguvêse. Bihna min pir teng e.

Xelîl bûbû wekî masiyekî ji çem derkefi, tarîka çavê û bêhêvîbûna dilê wî, dida ber hev re. Gelek bûyeren dijwar di serê wî re derbas bûbûn. Zehînetiyê herî bi eş û belayên xerab di nav dilê wî de hêlin çekiribû. Belê wekî vê şevê tu caran xwe bi tenê nedîtibû. Ev-qasî bêmefer û bêhêvî nemabû.

Xelîl nêrînîn kûçikê xwe qet ji bîr nekiribû. Nêrînîn tûj û bi lome. Wî dizanibû ku hiha li gundê E... dilê xakê, lawir û çükên çiyê, kaniya jorîn hinaren bi daran ve, gûzên weşiyayî.

Dilopên xwinê di şeva kambax û malixerab de, xwe bi ser ramanê wî de berdida. Niha pisîngîn gund, lêdan û tadeyyîyê ji destê zarokan nebîn jî, disa ne bextiyar in. Di bin wî asîmanê şin de her tişt wekî Xelîl di bin tenahiyeke bi tirs de ye.

Dema ku dengê banga mele ji oparloyê bi ser xewa sibê ya şîrin de belav dibûn, Sêvê ji zû ve ji xwe ve çûbû. Şewqa heyvê li rûyê wê dixist. Rûyekî gelek bi keder, eniya wê bi qermiçok bû. Bi tena binkiraskê çit bû keçika wê binevşê, xwe bi sînga diya xwe ve zeli-qandibû..

Jî şewata pêçiyê xwe Xelîl, bi xwe hisiya ku agir gihiştiye qûnika (dawîya) çixarê pir tâhm ji vê titûn nedigirt. Titûna kewaşê bû. Xalidê Elî, misînê xwe yê sifîri dagirt. Avdest (desmîj) girt, sicade li ser textê li hewşê rast kir. Berî ku dest bi limêja sibê bike, çend caran bang kir Xelîl.

—Biraziyê Xelo, biraziyê Xelo ma tu ranabî limêjê? Ji wî, wê ye ku Xelîl razayıye. Xelîl tê neanî der ku ew hisyar e. Qet dengê xwe nekir.

Di vî bajarê ku bi hezara wekî Xelîl tê de şeveke wilo malkambax derbas kirine de, mirovîn ji xebatê xwe qutbûyi, niha xwe amade dikin, ji bo çûyîna karê barkêsiyê, sirotina fêkî û dane-heva pembû.

Di vê demê de tarî û ronahî li ber hev didin. Yek naxwaze rî bide ya din. Lê wekî her caran, ronahî zora reşîyê dibe. Ronahî, giran giran û bi naz xwe bi ser vî bajarê kozmopolit de berdide.

Gelek mirov hatine vî bajarî. Çend şevênen xedar derbas kirine. Şev û roj û her keliyê wan mîna şeva pêşî ne. Lê haya wan jê tune ye. Di nav pîkoliyê mitala, aboriyê malbata xwe û tîrsa êrîşen polisan ên di wexta berbangê de, jiyanke bi hesret û xemgîn li dûrî welatê xwe, derbas dikin.

Xelîl Sêvê ji xew hisyar kir:

—Sêvê rabe roj hilat. Em xwe berdin jêr.


Du firoke ji Balafirgeha Încîrlîkê bilind bûn. Birek (qeflek) kevok jî, ji ser xaniyan ber bi asîman ve sıfrî.

Sêvê bi dengê firokan veciniqî. Xelîl çend deqe li firokan nêrî...

HESEN ZINAR

## Kurdistana bi fîftî fîftî


**N**avê pirtûka Osman Aytar e. Aytar di vê xebata xwe de li ser rewşa Başûrê Kurdistan rawestiyaye. Tê de, mijarên wekî pirsgirêkên ku bi avabûna parlamentoyle li herêmê rû dane, hêzên li herêmê, xwestina wan a ji bo ku bi hejmareke zêde di parlamentoyle de cih bigirin, daxwaza wan a ku dixwazin zêdetir bibin xwedî soz. Pişti çêkirina qanûna hilbijartîn jî bi wekhevî di parlamentoyle de cihgirtina her du hêzên herêmê, li ser rengê demokrasiya ku li herêmê pêk hatiye, li hevnekirina hêzan û di dawiyê de jî careke din dest bi şerkirina wan, hene. Osman Aytar, bi hevpeyvînan, rewşa xerab derxistîye holê. Di pirtûkede, li ser mijarên ku DFK'ê (Dewleta Federasyona Kurdistanê) daniye pêş xwe, tengasiyên ku dewleta Tirkiyeyê derxistîne pêşberî wê jî, tê rawestin. Pirsgirêkên bingehîn wekî aboriya Kurdistanê, parasatin û ewlekî, pêşveçûna perwerdekariyê, pêwistîya tenduristiyê, avakirin û xizmetîn bajaryanîyê, mafen mirovan û mafen neteveyî, gavêni ji bo rawestandina şerê xwekujiyê bi râydarên hikûmeta kurd dide muneqesekirin. Çapa yekemîn a vê pirtûkê li Stockholmê çêbûye. Çapa duymîn a pirtûkê, ji aliye Weşanxaneya Nûjen ve li Stenbolê hatiye kirin.



Kurdistana bi

## Çîroka aloziyan di şeva toreya kurdî de

EVDILHELÎM YUSIF



Ramaña herî girîng iro ro ku di hiş û dilê her nivîskar û helbestvanê kurd de cih digire, ew e ku çawa emê toreyekê (edebiyateke) kurdî ya nûjen bînin meydanê, da ku toreya me jî cihêkî girîng û berçav bigire di nav toreya cihanê de. Di vê riyê de jî gelek nêrîn û raman tevlî hev dibin. Niha emê hinekî vê pirsgirêkê bidin ber ronahiyê. Di van salêr dawîn de gelek gav hatin avêtin, ber bi avdana dara zimanê kurdî ve. Bi rastî gelek zingar ji ser ziman tê hilanîn û roj bi roj rewşa wî xweşîr dibe.

Tevî ku hin karêñî zor û giran li hêviya rewşenbîr û zimanzanê kurd in, ku hîn jî di vê riyê de gavêni xwe yî pîroz, xurtir û firehtir bikin. Lî li hember vê meşa bi rûmet gelek caran jî toz radibe û çavên hinek rewşenbîr û nivîskar di nav wê tozê de dikutkute. Û nema xweşîk aloziyan jî hev derdixin. Yek ji van aloziyên mezin jî, têkiliya di navbera toreya kurdî û toreya biyanî

## Kundê kor

E dip Polat, ev romana Sadiq Hidayet ji tirkî wergerandiye kurdî. Pirtûk, ji aliyê Weşanxaneya Kora ve hatiye çapkiran. Hidayetîraniye û eslê romanê bi farisî ye. Sadiq Hidayet, di vê berhemâ xwe de jiyana ku jiyaye nişandîye. Tu demen Sadik Hidayet bêereq derbas nebûye. Lewre ew dixwaze rastiya jiyane bi jiyana xwe wekî mînak nîşanî mirovan bide. Anglo mirov dikare bibe evîndarê jinekê, mirov dikare ereqê jî vexwe, lê jîyan her dîsa jî didome; mirov dikare di wê navberê de xebatekê jî bike.. Aliyekî romanê yê girîng jî, hesabênoj roj û salan jî li gorî salnameya kurdî û Newrozê

tê, de hatiye kîrin.

Me di serî de got ku Edip Polat ev berhem wergerandiye kurdî, divê em hinek ji wî jî behs bikin. Edip Polat li Amedê mamostaetiya biyolojiyê kiriye û ji ber rewşa wî ya siyasi, ji ma-

mostetiyê hatiye dûrxistin. Polat pişt re dest bi nivîskariyê kiriye. Pirtûkên ku wî nivîsandine xelat standine. Ji nivîskaren azad ên navneteveyî xelatek standiye û ew endamê PEN'ê ye.

Der barê pirtûkên ku wî li ser kurdan nivîsandine de doz hatine vekirin.

Kora Yayın, Alaykökü cad. Küçük Sk.  
Nо: 3 Kat: I Cağaloğlu/İstanbul

de ye. Anglo çawatiya pêwendiyêni di navbera berhemêni me yî toreyî û berhemêni toreyî yên li cihanê heta dawîya sedsala bîstan hatine nivîsandin de, ye. Gelek nêrîn me, di nav derya birçibûna ji zimanê kurdî re, winda dibin û difetisin. Û her nivîsareke bi kurdî rind û bilind û pak dibînin. Û dixwazin van nêrîn xwe veşerîn di bin siya qedexekirin û lipaşmayîbûna millet û zimanê me de. Heta pêpelûka ku yek ji van rexnevanê me yî dilpak, ci berhem, pexşan an helbest bi kurdî li ber bête xwendin, bi dengekî bilind dibêje: "Ev tiştekî nû ye di toreya kurdî de." Bi vî awayî hemû tiştekî nû dibîne di çarçoveya tore û hunerê kurdî de. Lî dema pîrsa wate (mistewe) û nirxa hunerî tê ziman, dibêjin: "Tu çawa nivîsarêni kurdî didî hemberî nivîsarêni biyanî yê ku bi sed salan serbest bi zimanê xwe dinivîsin." Toreya kurdî dikin zarokeke ku bi çarlepikan dimeşe û bejna toreya milleten din bilind dikin.

Toreya me dixin xaniyekî girtî û bêpencere. Û li benda şînbûna wê ne, ez jî bi xurtî nabûna xwe diyar dikim, li hemberî vê nêrîna tevlihev û yekçav ya ku tu cudahiye naxine nav ziman û toreyê. Û bi vî rengî dikarin ci kesê ku xwe nû hîn dike bi zimanê kurdî binivîsîne, biajon ber bi

## Şahidê bêdeng

Rojnameger Ramazan Öztürk bi navê 'Şahidê bêdeng' albûmek derxist. Öztürk bi wêneyêne xwe, dîmenê cihêreng ji bûyerêni dinya û Tirkîyeyê, di navbera sala 1974-1995'an de, pêşkêsi mirovan dike. Pirtûk ji 295 rûpelêni kurdî û wêne ne, dagirîfî ye û li gorî cihê ku lê wêne hatine kişandin, hatiye beskirin. Di destpêka her besî de, li ser bûyeran agahî hene, beşa li ser Tirkîyê û ya li ser kurdan geleki balkêş in.

Jixwe wêneyêne ku ji Qetîlama Helepciyê kişandine, bûne klasik û her wisa gelek wêneyêne wî xelatên navneteweyî standine.

Ramazan Öztürk ev bersiv da pîrsa me ya bi rengê "Hûn karin li ser vê pirtûkê ci bibêjin?"



-Di vê pirtûkede dîmenê şer û hovîtiyê hene ku ew tişt li ser rûyê dinyayê û bi destê mirovan tê kirin. Divê hin mirov wan dîmenan bibînin û berpirsêni wan hovîtiyan nas bikin. Jî bo ku dîmenê wisa kêm bibin.

Li hemberî pîrsa bi awayê, "tişten bi vî rengî li Tirkîyeyê jî dibin, wekî Qetîlama Basayê. Hûn dikarin li ser vê ci bibêjin?" Öztürk got:

-Qetîlama Basayê, hovîtiya herî mezin a salêr dawî ye, diviyabû evbihata teşîrkirin, berpirsêni bûyerê eşkere bibûna, bihatana darizandin. Lê mixabin, ew ên ku ji xwe re dibêjin rojnameger, qet li ser vê bûyerê nesekinîn.

Bi dehan rewşenbîrên aştixwaz çûn cihê bûyerê, gelek dîmen anîn ji wir. Lê tu kesî ji rayedarên artêşê nepirsî, ka çîma ev bûyerê çêbû.

Ev pirtûk di nav weşanên Sabahê de derketiye.

wêneyeke toreyî. Ev jî gelek xirecir û qerebalixa vala, di warê toreyî de zêde dike. Pêşketina ziman cuda ye ji pêşketina tore û hunerê kurdî, tevî ku pêwendiyêni xurt jî di nav wan de hene.

Di hêlekê dîtir de, di baweriya min de, nivîskarêni kurd dikarin gelek sûdeyê bibînin ji toreya cihanê û vê valahiya di toreya xwe de (ya ku niha li ber çav e) dagirin. Jî ber ku tore, huner bermahiyek mirovî ye, gelemperî ye û tu kes an tu mîlet nikare pêşketin û bilindbûna şêwe û teknîkîn hunerî di warê roman, çîrok, helbestan de bike milkê xwe bi tenê. Ev wate û şêweyêni ku iro huner û tore di xeleva wan i xweşîk de heye, tiştekî cihanî ye.

Em kurd jî, divê li ser rûyê cihanê roleke berçav bigirin û tiştekî me jî bê damezrandin, di vê pêvajokê de. Ev rol jî nayê holê bi xweziyan tenê. Divê rî li ber nivîskarêni kurd bê vekirin, ku hemû şêwe û teknîkîn hunerî, hemû celebêni hunerî ji xwe re bikin bingehî ji bo avakirina nûjeniyê di tore û jiyana me de.

Gelek carî şewitandina konaxan pêwist e ji bo ku mirov nemîne di nav toza tu kesî de û jî nêrînen teng rizgar bibe. Wisa (bi nêrîneke toreyî) ez dikarin bibêjim ku Dostoyevskiye "kurd e" û bêhtir jî Feqê Teyran nêzîkî dilê min e.


5

axuyaniyê bi zimanê nûjen, bi zimanê fermî, pirsgirêkên evîna Melehet û Sametê çare-ser nake. Evdilqadir Beg ne hiqûqê, ne jî qanûnê nas dike. Jixwe Melehet û Samet pê nizanin, gelo hiqûq û qanûna evînê heye? Melehet birtyarekê digire ku bersiva nameya Samet bide, lê nameya ku Sametê ji Melehetê re şandiye ketiye destê Evdilqadir Beg û hêrs bûye. Hêzeke çakûc daniye ber malê ku li dijî êrişê Samet xwe biparêze. Ji aliyeke jî xwezgîniyê Melehetê qor bi qor têne û diçin. Melehet dinêre ku Evdilqadir Beg ewê, wê bide yekî û bi dizî nameyekê dişine ji Samet re.

"Evîndarê min ê birêz Samet;

Ez li halê te napirsim, ez zanim halê te ji halê Boris Yeltsin jî xerabtir e. Birêz Samet, lê dîsa jî tu destê xwe giran digirî, wê niha programa hikûmeta anayolê bê eşkerekirin; tu hê li malê rûniştiyi. Hikûmeta anayolê piştgiriya Evdilqadir Beg dike û ew jî dibêje ez xîcikeke xwe ya gurçikê jî nadime Samet. Jixwe Evdilqadir Beg di zewacêde li modeleke nû digere û dibêje modebla İsrailê. Jixwe wê rojê Şimon Perez û çend wezîrên wî, hatibûn ku min ji lawê Perez re bixwazin. Modela Şimon Perez ev bû; piştî dawetê sala yekemîn emê li Tel-Avivê bimînin, du salên paşîn emê li Gümüşxaneyê malekê kirin, sala paşîn jî emê vegerin

## Evîna Fermî (2)



Tel-Avivê.

Bavê min hindik mabû ku vê protokolê imza bike, di Televîzyona MED'ê de konsera Ozan Merûf dest pê kir. Ozan Merûf dest bi kilamekê kir, kila ma wî nêzî şes rojan dom kir û bavê min di xew re çû, protokol xera bû. Yanê Xwedê ji Ozan Merûf razî be ku di

van rojê zor de, me bi tenê nahêle. Heke rojekê daweta me çêbe emê gazî wî jî bikin, lê ji bo silametiya dawetê emê piştî dawetê gazî wî bikin.

Evîndarê min ê ne birêz, te xwe avetiye erdê he? Ev ci halê te ye? Xweli li serê te biyo, xelk tê xwezgîniya te dibe, xebera te ji bayê felekê tune. Ha min

got felek, hate bîra min, dibêjin hin mirovêne felekê ji ezmanan û ji nav stêrkan hatine dinyaya me. Carinan xwe nişan didin û carinan jî xwe vedîşerîn û li gorî rîwayetekê çend kes ji wan di "Koma Gulen xerzan" de xebatê xwe didomînim. Yanê dema ku "Koma Gulen Xerzan" dest bi programa xwe dike berî her tişî gazî felekê dikan.

Li gorî efsaneyê, Felek û sê hevalên xwe rojekê ji ezmanan dadikevin dînyayê. Sê hevalên Felekê, yek dikeve başûrê Afrîkayê ku niha bûye alîkarê Nelson Mandela, yek dikeve Srilankayê û yek jî dikeve Alaskayê û Felek bi xwe jî dikeve Sertê. Piştî operasyona tîmân taybet û qoriciyan, endamên "Koma Gulen Xerzan" wî di nav baxçeyeki de dibînin û wî mezin dikan. Felek dema mezin dibe, ji wan diqete û diçê li Stenbolê ji xwe re li kareki digere. "Koma Gulen Xerzan" jî bi pey Felekê dikeve û tê Stenbolê, dîsa jî Felekê nabin. Efsane jî wisa diqede.


Evîndarê min ê birêz, nizanim te ji vê efsaneyê tiştekî fêm kir gelô? Welehi bi xwe min tiştekî jê fêm nekir. Em dîsa vegevin ser meseleya xwe. Birêz Samet; binêre bavê min li modela İsrail digere û tu jî êdi livbaziyê li modela Hamasê binêre. Ez li benda livbaziyê te me, em programa xwe li gorî sedsala bîst û yekê amade bikin. Bimîne di xweşiyê de.

Amed Masun

## XELAT...

## XACEPIRSA BIXELAT (10)

## XACEPIR-



Bersiva Xacepirse (8)

Xacepirsa me bixelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 10'an kitêba

Sadiq Hidayet  
"Kundê Kor" e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di navu qutîyen li bin xacepirse de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişin.

Kesên ku xelata xacepirsa 8'an kitêba Cegerxwîn "Şûrîn Windabûyi" qezenc kirine: Kemal Başak/Nigde, Resul Çelik/Izmir, Fuat Înan/İstanbul, Mustafa Kara/Konya, Mahir Kürkçü/İstanbul, Orhan Çetintas/Şanlıurfa, Remzi Kolhanlı/Şanlıurfa, Halil Şimşek/Adiyaman, Cuma Sormaz/Manisa, Sengül Güll/Adana

Rêxistîneke Irlandî	Sembola Terbiyûmê	Oksijen	Pêxember ek	Navê rojekê	Qerf
Zimanê ereban	Kesê dî wêne de	En ji Iranê	Înan	Kurusava	
↳	↓	1	Hêsanî Din		↓
Sembola ziv	→	Rewşen	↓		Hafliza
Herfek		Lumpen			
3	Yê vê salê Navek	2	Naveki mîran Muavin	→	4
Kura agir	→		Zarif Ling	↓	
Cinavkek	5	Partiyeke tirk (kevn) îca	Kesê lor Dayik	→	
Silayt	→	↓	Hew	↓	
Çemek			Terimeke kompitûrê		
Qertafeke neyînîyê Gihane- kek	→	↓	Parkitek. Li Tirkiyeyê partiyek	→	
		Bi kirdiki bi hev re	↓		
	Nûner	→			

PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5



## Nivîsin baldariyê divê

**Belê bi ser her awayî de, divê bê gotin ku ger rewşenbîrekî kurd tevî hemû qabiliyet û demên xwe, her imkanî li ser meseleya nivîskariya bi zimanê kurdi terxan neke, zanîna teknîka ziman ji xwe re neke rêber, ne mimkun e ew di vê arîşeyê de bi ser bikeve.**

nadin gramera kurdi hûn ne tabîne.

Me jî li ser vê yekê hinek çewtiyên ku ne karê aqil in, tesbît kîrin. Niha li xwarê, di gel awayê rast emê wan li pey hev bikin rêz:

Çewt, ên li ser in, ên li binî jî rast in. Di warê muzikê de xebata we tê xuyan. (hej 4-rûpel 16)

– Di warê muzikê de xebata we xuya dike?

Min hingî di bersiva de dabû xuya-kîrin (Fırat Cewerî)

– Min hingî di bersiva xwe de dabû nişandayîn. (Xuyakîrin tecelli kîrine / bi tirkî görünmek)

Lê wî tenê, bi serê xwe û bi darekî mirovkuj qewirandîye.. Lê di nav de gelek nebihûrî. (hej.4 rûpel 10 Rahmî Batur.)

– Lê wî tenê, bi serê xwe û bi çovêkî mirovkuj qewirandîne / Lê di nav de gelek nebihûrî...

Balê dikişîne mijareke girîng. (hejmar 4, rûpel 1. Serpêhatî)

– Balê dikişîne ser mijareke girîng Serpêhatî: Fiîl “bi ser hatîn” e. Hedîse bi ser mirov tên.

Di navbera xwe de gengeşî kîrin (ji hejmarê berî niha)

– Di navbera xwe de muneqeşe kîrin. Gengeşî, ne di wateya muneqeşê

de ye. Wateya wê tevlihevî, kaos e..

Da nişan ku li me bêbext in.

– Da nişandan ku li me bêbext in Hûn hewcedariyê pê nabînin. (hej. 4. rûpel 16)

– Hûn hewceyiyê pê nabînin. İstimala gel wisa ye, lê ya rastir “Hûn hacet pê nabînin” e.

Ağahî jê nehilandin.

– Ageh jê nehilandin. Di kurdi de ageh nûcye ye, di Farisî de “xeberdar” e ya rast wateya wê ya bi kurdi ye.

Ezê xebatê xwe vebêjim/vegotin. (hej. 4, rûp. 5)

– Ezê xebatê xwe vebêjim / gotin Her du gotin jî bêbinyat in.

Ji lew re / Ji lewma.

– Lewra: Çimkî / Lewma: Bi vê egerê, ji ber vê.

Sûc

– Ji binyat ve ‘sunc’ tîrkan ji me gitîye. Bi bandora tirkî tê teleffûzkîrin.

Çavên we bi ronî bin (hej. 4, rûpel 2 ji şlanê)

– Çavên we ronî bin.

Ez çûme malê got.

– Tam li gorî mantiqê tirkî ye. Tu caran fiîla ‘got’ ne mimkun e li paşıya cumleyê bê danîn

Got: “Ez cûm malê.”

...dixwazim pirsiyarekê bikim.

– Dixwazim pirsekê bikim. Pirs ji xwe sual e, pirsîyar jî yê ku dipirse ye.

Hetanî/ heyânî, ewlekarî, anîn zi-man.

– Heta, ewleyî, ifadekirin (teqlîda ji tirkî ye).

Ew gotin vala deranîn

– Ew gotin pûç kîrin. (Bêbinyat kîrin)

Bobelat: Ji “belawat” a erebî ye. Be-la ne xweşiktir e, an jî bila yeke xweş-tir bê peydekirin.

Nameyek şand ku halê xwe bêjin

– Nameyek şand halê xwe bêjin.

Nûjen, honandin, pêçandin

– Hevdem, hûnan, pêçan.

Bêşik encam ev e ku bes têkoşîn bo kelimeyên kurdi yê resen ne bes e, divê riayeta bi bal ji qayideyên ziman re jî hebe, da ziman şopa xwe ya esasî winda neke, heke na emê hemû tim xwedîyê kurdiyeke perpitî u bêtîbar bin.

Bi hêviya, gava hûn dînîvisin bêhtir baldar bin li gramerê .

**Ji Ferhengê:**

Dêhn: Bal

Dirûv: Sîma

Heyam: Dewr

Hezirkîrin = texmîn kîrin

Gengeşî: Tevlihevî, kaos

Pevû: Digel

Saw: Tirs, xof

Sosret: Ecêb

Tekûz: Tam çêkirî, mezbût

Tekîl: Eleqedar

Xeşîm: Kesê di karekî de nû û bê tecrûbe.

NOFA ZIMANPERWER

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER


Gerinendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMŞİZ  
Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu): SAMÎ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMÎ BATUR  
Berpirsê Karê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ  
Berpirsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan İşık Sok. No:23/3 Beyoğlu-İstanbul  
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19

Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

# Heyfa min nayê li mirin û kuştinê lê...



Xurcika stranê kurdan, bi qîrîna hawarê, bi nalînê birîndaran hatiye dagirtin. Di zebareya paleyan de, roja cejn û şahiyân, di govend û dîlanê de jî, ji stranê kurdan her êş û jan diçe... Hin caran li şewitiya Bingolê, li ber malan, Zekî tê kuştin; ji dayikê "zeman xerab, negirî dayê" tê xwestin, caran jî termê Mîrê Xerzan dimîne li ber berf û baranê, bêkes, bêxwedî...

"...Ey avêvê evara bextreş!!  
Ey sorgulên vê adara dilşikeşti!!  
De kelekên şîniyê rawestînin..."

Ehmed Huseynî

**G**elo çend stranê kurdan hene ku di dilê wan de ne birînê bêderman bin, ne bi xwînê hatibin hevîrkirin, û ne bi hêstirê çavan hatibin kewandin?.. Çend stran?...

Ka ji kûrahiya bîra xwe stranê ku hûn dizanîn derxin, di hişê xwe de derbas bikin, ca di nav wan de çend stranê ku bi temamî ji kîf û şadiyê re hatibin çêkirin, hene?

Xurcika stranê kurdan, bi qîrîna hawarê, bi nalînê birîndaran hatiye dagirtin. Di zebareya paleyan de, roja cejn û şahiyân, di govend û dîlanê de jî, ji stranê kurdan her êş û jan diçe...

Hin caran li şewitiya Bingolê, li ber malan, Zekî tê kuştin; ji dayikê "zeman xerab, negirî dayê" tê xwestin, caran jî termê Mîrê Xerzan dimîne li ber berf û baranê, bêkes, bêxwedî...

Ü yek devê xwe dixe zengoyê Bavê ipekê, dibêje: "Tu bi xêr û silameti hatîapo, kekê min kanê?"

Ü adar mîrkuj e... Alem berê xwe dide oxirê, pişta xwe dide felekê... Lî kurd her tim û her car oxirê li pişt xwe dihêlin, berê xwe didine feleka bêbext...

Ü car heye ku bi sed hezaran kurd di mij û tariya "Enfal"ê de winda dibin, bêhis û bêdeng... Car heye ku li ser sergoya Newala Qesaban, kûçik bi goşte lehengê kurdan têr dibin...

28'ê adarê jî stranek ji jan û kulê ye, hawareke bêdeng e... Gir û hêrseke bêdawî...

Di 28'ê adara sala 1986'an de, serleskerê HRK'ê (Hêzên Rizgariya Kurdistanê) Egît, li Çiyayê Gebarê hate kuştin.

Di şeran de, jiyan û mirin destebirakê hev ên herî nêzîk in. Şer li ser mirinê ava dibe. Yê bikuje, xwe ji mirinê re jî amade dike. Lî şervanê kurdan bi mirinê jî nafilitin, pişti mirinê, neyarê wan, wan dikin xencerên dudey, û pê dilê kurdan, dilê nas û dosten wan diqewêrin... Serê wan jê dikin, dil û hinavêwan wan diqelêşin, wan dişewitînin ji bo ku kurdên mayî, ne carek rojê sed carî bimirin...

Termê Egît jî, li bajarê Sêrtê avêtin

ser sergoya Newala Qesaban. Ne tenê termê Egît, gelek kuştîyên kurdan, di wî sergoyê de temartin. Di dawiyê de kûçikan bi pêkolînê termê wan derxistin, xwarin; li bajêr, di nava kurdan de parçeyê laşen wan gerandin...

Gelo ku Feyzi Çakmak ne li Goristana Eyüp'ê raza, ew jî bi awayê ku Egît hatiye veşartin,bihata temartin, wê tirk pê çiqas şad bibûna?!

Hinek mirin li serê qatilan dibine bela, ji bo wan dibine xwekuştin, lewra kuştina Egît, doza wî bi paş ve nebir, bêhtir li pêş xist. Hevalen wî roj bi roj li ser çiyan, li gund û bajaran zêde bûn. Ü hêz bu artêş...

Kuştin tişteke, di hiş û bîrên xelkê de vekirina birînê bêderman, tişteke dine; weka kunêrekî radigire û di dawiyê de der debe...

İro li vî welatî şekere giran tê meşandin, êdî ne tenê dayikê kurdah, yên tirkan jî reş girê didin, hêstiran dibarînin. Dengbêjên kurdan ne beredayî di gelek stranê xwe de gotina "Heyfa min nayê li kuştin û mirinê lê..." bikar tînîn.

RAHMÎ BATUR

## EGIT

Ciyayê Gebaro, Ciayayê Gebaro  
Ax tim bi derd û kul û hawaro  
De ji xwe re bike pişti û baro  
Em mane bêcî, mane bêwaro

Xewa min nayê, xewa min nayê  
Serê min dêşî ji derdê dînyayê  
Birîna min kûr e, derman lê nayê  
Kula Şer Egît ji dilê min dernayê

Ciyayê Gebaro, ciyakî bilind i  
Tuyî hêlinâ şer û piling i  
Ciyayê kurdanî bi nav û deng i  
Çima bindest i ta heyâ kengê

Hêstirê çavan bes bibarîne  
Dilê miletê kurdan birîn e  
Lingê neyaran ji ser xwe hilîne  
Kêsa dijminan bes li me bîne

Ciyayê Gebaro ciyayê kurdan i  
Tu xêz û xopa van dijmina yi  
Ji Egîtan re rê û bir veke  
Ji dijminê xwe re mezelan çêke